Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1279 | 4-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 2025: Di zanist û teknolojiyê de gavên nû

**Navenda Nûçeyan**

**Sala 2025'an di zanistî û teknolojiyê de dibe ku bibe saleke diyarker e. Ji sirên mejiyê mirovan heta bi sira madeya tarî bi van projeyan re tê xwestin, hem jiyana mirovan bê başkirin hem jî aliyên nayê zanîn ên gerdûnê bê keşifkirin.**

Projeyên sereke yên ku wê aperoja teknolojî û zanistê diyar bike û armancên wan bi vî rengî ne:

### Danîna nexşeya genetîk a mejiyê mirovan

Danîna nexşeya genetîk a mejiyê mirovan bi yekbûna qadên genetîk û zanista rehikan re ber bi dawiya sedsala 20'an berfireh bû. Piştî ku Projeya Genomê Mirov (HGP) sala 2003'an temam bû, di lêkolînên biyomedîkal de bû kêliyeke diyarker û ji bo fêmkirina avaniya genetîk a mejî rêyên nû diyar kir. Projeya Human Brain ji aliyê Komîsyona Ewropayê ve sala 2013'an hate destpêkirin û ji bo fêhmkirina avaniya tevlîhev a mejî bû hewldaneke welê ku bi bikaranîna mejiyê çêkirî û teknolojiyên daneyê mezin derkete pêş.
Proje ji bo fêhmkirina şîfreyên genetîk ên mejî algorîtmayên mejiyê çêkirî û teknîkên diyarkirina nexşeya genetîk bi kar tîne. Tevnên rehikan û têkiliyên genetîk ên navbera herêmên cuda yên mejî xala diyarker a vî karî ye. Her wiha lêkolînkirina koka genetîk a nexweşiyên norolojîk ên weke Alzheimer, Parkinson û Otizmê hewl tê dayin rêbazên dermankirinê bê afirandin.

Bi sala 2025'an re armanc ew e ku hewldanên ji bo danîna nexşeya genetîk a mejî û ahengiya van agahiyan li rêbazên tedawiya şexsê bê temamkirin.

### Rê û rêbaza hilberîna enerjiyê ji fezayê

Fikrê hilberîna enerjiyê ji fezayê di salên navîn ên sedsala 20'î de weke çîrokeke zanistî hatibe dîtin jî di sedsala 21'ê de bû armanceke rasteqîn. Konsepta, li şûna wergirtina enerjiya rojê ji ser rûyê erdê hilberîna wê li fezayê û ragihandina vê enerjiyê bêyî qeblo ji cîhanê re, bi karên saziyên mîna NASA û Ajansa Fezayî ya Ewropayê kete rojevê. RESPONDET projeyeke ku dixwaze vê teknolojiyê bi rêbaza enerjiya dikare nû bibe re bixe nava ahengiyê.

### Malzemeyên zindî yên ku dikarin xwe sererast bikin

Fikrê malzemeyên dikarin xwe nû bikin, bi sûdwergirtina ji hunera xwenûkirinê ya xwezayê di salên 1990'î de destpê kir. Karê destpêkê li ser polîman û malzemeyên weke beton destpê kiribe jî lêkolînên li ser bikaranîna organîzmayên zindî di deh salên dawî de zêde bûn. Projeya AM-IMATE hewldaneke pêşeng e ku materyalên biyolojîk ên mîna kuvarkan ji bo afirandina avaniyên nûkirî bi kar tîne.
Di çarçoveya projeyê de bi bikaranîna mîselyûmê re ku avaniyên kokê yên kuvarkan e, malzemeyên avaniyê yên dikarin nû bibin û xwe nû û sererast bikin, têne afirandin. Ev malzeme li derdora avahiyan, mobîlya û ambalajê li qadên cuda dikare bê bikaranîn. Armanc ew e ku heta sala 2025'an ev malzeme pêşkêşî qada bazirganiyê bê kirin û di sektora lêkirina avahiyan de şoreşekê biafirîne.

### Di parastina mozan de nêzîkatiya teknolojîk

Kêmbûna populasyona mozan di salên 2000'î de veguherî pirsgirêke welê ku bala zanyarên hawirdorê kişand. Ev rewş li ser hevsengiya ekosîstemê û hilberîna çandiniyê bû gefeke cidî. Projeya B-GOOD ji bo başkirina tenduristiya mozan bû hewldanek ku teknolojî û analîtîka daneyan gihand hev.
Daneyên li ser germahî, nêm, deng, liv û tevgera mozan a li kewaran, bi algorîtmayên mejiyê çêkirî tê nirxandin. Mêşvan jî bi sala van daneyan li ser rewşa tenduristiyê ya kewaran dibin xwedî agahî û destwerdana pêwîst jî dikarin di dema xwe de bikin. Armanc ew e ku di sala 2025'an de populasyona mozan bê parastin û hilberîna çandiniyê bê dewamkirin.

### Bajarên hîn kes û domdar

Domdariya bajaran ji nîvê duyemîn ê sedsala 20'î û pê ve bû xaleke girîng a tevgerên hawirdorê. Di salên 2000'î de jî tekonolojiyên avahiya kesk û plansaziya bajarê ekolojîk navdar bû. Projeya CRAF projeyeke nûbûyî ye ku nêzîkatiyeke li tevlîkirina civakê û hunerê ya li veguherîna ekolojîk a bajaran nîşan dide.
Proje xwedî wan armancan e ku li bajaran qadên kesk bêne zêdekirin, rêyên bîsîkletan bêne zêdekirin û avahî bi berhemdariya enerjiyê bêne avakirin. Hunermend û civakên xwecihî hevkariyê dikin û modêlên bajaran ên domdar ava dikin.
CRAFT ji xwe re dike armanc ku sala 2025'an domdariya hawirdorî



ya bajaran û avakirina qadên hîn jiyanî pêk bîne.

### Keşifkirina elementeke nû

Keşifkirina elementên giran ên super ji salên navîn ên sedsala 20'î û pê ve bû parçeyekî girîng ji lêkolînên nukleer fîzîkê. Elementên dawî yên li tabloya periyodîk li qada laboratûwarê hatine sentezkirin û her yek ji wan li gel ku temenê xwe kurt jî be li qada fîzîka atomê agahiyên girîng bi xwe re aniye.
Keşfkirina elementeke nû ya super giran, wê bi bikaranîna amûra bilezkirina parçikan û cîhazên pîvandinê yên hesas pêk were. Taybetmendiyên avanî yên van elementan li qadên weke enerjiya nuklerê û avakirina malzemeyên nû dikare gavên girîng bide avêtin. Di sala 2025'an de bi keşifkirina vê elementê re tê xwestin, tabloya periyodîk û feraseta fîzîkê ya binê atomê bê kûrkirin.

### Sira madeya tarî û enerjiya tarî

Pênaseyên madeya tarî û enerjiya tarî di salên navîn ên sedsala 20'î de hatin ragihandin. Lê belê karên cidî yên destpêkê yên ji bo fêhmkirina van hêmanên nepen, di salên 2000'î de destpê kirin. Teleskopa Fezayê ya Nancy Grace Roman û tecrûbeya weke XENON, dixwaze li vê qadê gavên girîng biavêjin.
Diyarkirina nexşeya belavbûna madeya tarî û pîvandina bandora enerjiya tarî li ser berfirehbûna gerdûnê ji armancên bingehîn ên van projeyan e. Teleskopên pêşketî û dedektorên binê erdê di van lêkolînan de bi roleke girîng radibin.
Sala 2025'an têkildarî madeya tarî û enerjiya tarî de dibe ku agahiyên şênber pêşkêş bike. Ev agahî jî ji bo fêhmkirina avaniya bingehîn a gerdûnê û paşeroja wê di asta krîtîk de girîng e.

### Di tipê de gavên nû: Crispr û şoreşa genetic

CRISPR (Clustered Regularly Interspaced Short Palindromic Repeats) ku tekonolojiya birêkûpêkkirina gen e, di sala 2012'an de bi pêşengiya Jennifer Doudna û Emmanuelle Charpentier ji cîhana zanistiyê re hate nasandin. Ev rêbaz bi sûdwergirtina ji sîstema xweparastinê ya xwezayî ya bakteriyan hate afirandin û kir ku deverên spesîfîk ên li DNA'yê bi rengekî hesas bêne birêkûpêkkirin. Di sala 2020'î de Doudna û Charpentier, ji ber karên xwe yên li ser CRISPR'ê hêjayî Xelata Kîmyayê ya Nobelê hatin dîtin. Ji ber ku ev teknolojî di dermankirina nexweşiyên genetîk de dikare şoreşeke gengaz pêk bîne, gelekî bal kişand.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Hatina baranê ji ewran kifş e:**
- Berî ku biqewime diyar dibe; berî ku tiştekî bike tê naskirin.

**Nîşana baranê ba ye, nîşana mirinê ta ye:**
- Her tişt nîşaneke wê heye.

**Roja xweş ji sibê ve xweş e:**
- Tişta baş û ya nebaş (yan jî kesê baş û nebaş) ji destpêkê ve diyar in.

**Şeva reş êvarê kifş e:**
- Berî ku biqewime diyar dibe; berî ku tiştekî bike tê naskirin.

**LI SER OXIR Û BÊOXIRIYÊ**

**Berxa bimakaxweketî ye:**
- Bêoxir e; bêyom e.

**Biçe ser deryayê wê biçikîne:**
- Bêoxir e.

**Rûyê wî yê xêrê ye:**
- Lingê wî li me hat; bioxir e.

**Rûyê wî li me nehat:**
- Bêoxir e.
(Dema yek diçe cem hina, piştî çûna wî dema tiştin ne xweş diqewimin hingê dibêjin)

**Wê serê hina bixwe:**
- Dimohriyan dike; bêoxiriyan dike.
(Dema di malbatê de, yek bêsedem her tim nexweşiyan, pirsgirêkan dertîne, jê rê tê gotin)

**LI SER PIÇÛKDÎTIN Û PIÇÛKXISTINÊ**

**Avrûya wî rêht:**
- Bêrûmet kir; şkênand.

**Bes bireyî:**
- Ji bo piçûkxistinê tê gotin.

**Cihê wî cihê pêlavan e:**
- Ti kes qîmet nadiyê; piçûk dibînin.

**Dev lê xwar kir:**
- Qîma xwe pê neanî; piçûk dît.

**Dûvê xwe daniye ser milê xwe:**
- Dixwaze şer bike; har bûye.
(Ji bo piçûkxistina mirovan tê gotin)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

**Bi kamîreya Ayşa Silêman**



## Bi têkoşîna Apoyî re jin careke din bi rola pêşengtiyê radibin

Di her serdemekê de jin her tim di şer û pevçûnan de bûye qurban. Di bin navê namûsê yan jî bi rê û rêbazên cûda hatiye çewisandin û jiyana wê hatiye reşkirin. Weke mirov jî nedihat hesibandin...**R-2**



## 'Nenavendîbûyîn rêya careseriyê ye'

Endama Navenda Firatê ya Lêkolînan Çinar Salih diyar kir ku Sûriyê niha ji nû ve xwe ava dike, herwiha Sûriyê ji gelek pêkhateyan pêk tê, ji bo wê jî girîng e ku ev pêkhate bi hestên ku ew jî parçeyên ji Sûriyê ne jiyan bikin û jiyankirina wê bi sîstema nenavendî pêk bê.**R-4**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1279 | 4-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## 'Çareserî, sîstema Hevserokatiyê ye'



Endama Desteya Rêvebera Partiya Sûriya Pêşerojê Zelal Cîger diyar kir ku armanca wan ji lidarxistina konferansa Hevserokatî, avakirina civakeke demokratîk e û siberojeke azad.**R-5**

## 'Ziman û wêjeya kurdî bi xebatê pêş dikeve'



Hevseroka Koordîneya Wêjeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Narîman Evdikê diyar kir ku her çiqasî beriya şoreşê ji bo pêşketin û pêşveçûna ziman û wêjeya kurdî gav hatibin avêtin, lê qedexeya li ser ziman her tim rê li ber pêşketina wê digirt, lewra bi şoreşê re gavên girîng hatin avêtin, lê ev gav ne têrkerin û xebatên mezin pêwîstin.**R-7**

# GAVÊN DÎROKÎ NE LI BENDA BERSIVÊ NE

Piştî banga Rêber Apo ya 'Aştî û Civaka Demokratîk' di serî de Partiya Karkerên Kurdistanê PKK û tevahî aliyên Kurdî bi erka xwe rabûn û gavên dîrokî avêtin. Lê heta niha dewleta Tirk ji bo serxistina pêvajoyê tu gavên erênî neavêtine. Endamê Desteya Edaletê ya Parlementa Tirkiyê û Parlamenterê DEM Partî yê Colemergê Onur Dûşûnmez bibîrxist ku serxistina pêvajoyê erkê tevahî civakê ye û got, "Rêber Apo û Tevgera Azadiyê erkên xwe yên dîrokî pêk anîn, niha dora dewletê ye ku bi erkê xwe rabe."**R-3**



## Di mijara Civaka Exlaqî û Polîtîk de; Kurd

Li gorî ku hatiye tesbîtkirin, di civaka neolîtîk de hemû nirx û pîvanên civakê xwe dispêrin bingehên exlaqî û mirovî. Rûxmî ku tê de beşeriyet û hişmendiya wê ewqas pêş neketiye jî lê di aliyên parastina pîvan û nirxên civakî de xwedî bingeh bûn. Ji vê nendika civakî bigre em dikarin bêjin û piştrast bikin ku civaka destpêkê ya xwezayî li ser bingeha nirxên polîtîk û exlaqî hatiye avakirin.**R-6**



**Ji jinên Sûriyê têkoşîna rûmetê tê xwestin** — Nehîr pale — R-2


**Pêwîstiya desthilata Şamê bi guhertina zihnî heye!** — Dilyar Cizîrî — R-4


**Pirsên civaka Kurd** — Farûk Sakik — R-5

**Sûriyê êdî di bin çavdêriya DYA û Îsraîlê de ye...** — Zekî Bedran — R-5


**Sînemaya Jinan li Rojava nebûye diyardeyeke gelêrî û civakî** — Kemal Necim — R-7

# Bi têkoşîna Apoyî re jin careke din bi rola pêşengtiyê radibin

**Selena Dêrik**

Di her serdemekê de jin her tim di şer û pevçûnan de bûye qurban. Di bin navê namûsê yan jî bi rê û rêbazên cuda hatiye çewisandin û jiyana wê hatiye reşkirin. Weke mirov jî nedihat hesibandin.
Jin hebûneke xwedî hest, fikir û îrade ye, lê pir caran kesî ev milê wê nedidît yan jî ji nedîtî ve dihatin. Tişta her tim ji bo kesên xwedî zîhniyeta serwer dihat xuyakirin ew bû ku jin weke barekî ye, nîşaneya xerabiyê ye.
Ew mirova xwedî li jiyanê derdiket û civak bi saya wê li ser piyan disekinî, hatibû rewşeke bîstûçar saetan kar bike, divê neweste û timî zarokan bîne dinyayê. Êdî ferqa jinê û makîneyekê ji hev nebû. Her çendî hin serdem ji yên dîtir cudatir bin jî, her tim di jiyanê, rêzik û biryarên serweran de jin tine bû. Weke zindiyeke ji her tiştî mehrûm dihat hesibandin. Jin tevî kedkara her mezin e jî dihat paşguhkirin. Di cîhanê de pir kesayetên girîng û navdar hene ku li pişt serketina wan teqez jin hene. Lê ew jina timî diafirîne, ava dike, bi rêk û pêk dike li pişt perdeyan dihat hiştin.
Bi derketina kapîtalîzmê re her çendî jin ji hinek qaliban hatibe derxistin jî, rastî tiştên ji demên berê xirabtir û qirêjtir hatiye. Eger mirov bêjin, "Rewşa jin niha li welatên kapîtalîst dijîn baş e. Jin di artêşên dewletan de eskeriyê dike, di saziyên dewletê de dixebite," ew mirov xwe dixapînin û di nav xefleteke mezin de ne. Ji ber jin li wan deveran qet ne bi îradeya xwe dixebite. Sîstema mêrê serwer li gor xwe jinê bi rê ve dibe. Ango sîstema serwer asta jinê û karê wê diyar dike. Jinê weke medayekê bi kar tîne. Jin di nav vê pergalê de li mal, dibistan, kar û xebatê de rastî neheqiyeke pir mezin tê û timî piştî mêr tê dîtin. Jinên kedkar di nav şert û mercên pir giran de bi mûçeyekî ji yê mêr pir kêmtir tê xebitandin.
Rêbertî hê di zarokatiya xwe de rewşa jinê baş tehlîl dike û ji bo peydakirina çareseriyên di vê mijarê de tim di nav lêgerînan de ye. Rêbertî her tim li ser mijara azadiya jinê ji her kesî cudatir difikire. Têkildarî jinek wê çawa bibe xwedî îrade? Wê çawa bibe xwebûn û nebe aîdî kesekî din? ket nav lêhûrbûnan. Rêber Apo ew hêza ku jin dikare pêşengtiyê bike didît. Li ser vê esasê bi avakirina PKK'ê re û hê di dema koma Apoyiyan de Rêbertî dixwest hevalên jin tevlî nav tevgerê bibin û xwe pêş bixin. Rêbertî di mijara azadiya jin, pêşxistina îrade û hêza wê de dest bi gavavêtinên nû kir. Rêber Apo destnîşan kir ku azadiya jin ji azadiya welat girîngtir e.
Bi hemleya Pêngava 15'ê Tebaxê re êdî jinan jî berê xwe dan çiyayan. Her çiqasî ji ber hinek ferasetên tesfiyekar rastî zor û zehmetiyan hatibin jî, bi mudaxeleyên Rêbertî û bi îradeya jinên weke heval Sara yên di Zindana Amedê de tif li rûyê zalim û faşîstan kir, bi sedan jinên leheng ên mîna (Binevş Agal) Bêrîvan ên di çalakiyan de bi ruhekî fedaî şer dikirin, bûn çira û rohniya rêya hevrêyên xwe. Her çû li her qadên têkoşînê rêxistinbûna jin xurt bû û tevlîbûna hevalên jin a Tevgera Azadiyê zêdetir bû.
Hevrê Besê Anûş Adara 1981'ê di şerekî li hember dewleta Tirk a dagirker de li Mereşê weke yekemîn şehîda jin a di nav refên PKK'ê de tevlî karwanê nemiran bû. Dîsa Ezîme, Xanim Yaverkaya, Rahîme Kahraman, Sultan, Bêrîvan di şexsê xwe de ji bo hemû jinên bindest û bi taybet jinên Kurd bûn şoreşgerên Apoyî yên avakirina jiyaneke bi rûmet. Ew şehîdên Tevgera Azadiyê bûn sembola jinên wêrek û berxwedêr. Xeta azadiya jin bi têkoşîn û berxwedana xwe pêş xistin.
Sala 1993'yan piştî şehadeta heval Bêrîtan di nav hêzên gerîla de yekîneyên xweser ên jin hatin avakirin. Ev li ser esasê



tehlîl, bîrdozî û ramanên Rêber Apo bû. Heval Bêrîtan a 25'ê Mijdara 1992'yan ji bo nekeve destê hevkar û xayînan heya guleya xwe ya dawî şer kir û xwe di kendalan de avêt xwarê, yek ji pêşenga Tevgera Azadiya Jin û artêşbûna wê. Ev tevger û artêşa jin hêza herî esasî ya avakirina kesayeta jina azad û nasnameya wê ye. 30'ê Hezîrana 1996'an jî heval Zîlan li Dêrsimê xwe kir bombe û dilê dagirkeriyê de teqiya.
Rêbertî îşaret bi vê yekê kir û got "Avakirina civakeke demokratîk bê jin nabe. Jin lingekî esasî yê civakê ye." Ev civaka demokratîk wê bi pêşengiya jinê pêş bikeve. Jinên şoreşger û Apoyî wê her tim bi rola xwe rabin û civakê rêxistin bikin. Rêber Apo yê 27 sal in li girava Îmraliyê ye di nav şert û mercên herî zehmet de jî bi fikir û perspektîfên xwe yên têkildarî têkoşîna jin û azadiya wê de hêz, moral û îlhamê dide hemû jinan. Di têkoşîna PKK'ê ya nêzî 50'î salî de, di şexsê jinên şoreşger Besê Anûş, Ezîme, Bêrîtan, Bêrîvan, Zinarîn, Zîlan, Sara û Delalan de îro jinên Kurd ji bo hemû gelên bindest û jinên azadîxwaz de bûne hêviya, "Êdî avakirina jiyaneke wekhev, azad û bêzext mimkun e." Ev teqez wê li ser esasê paradîgmaya Rêber Apo ya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê ava bibe û pêş bikeve.
Jinên Rojhilata Navîn û cîhanê niha xwe bi paradîgmaya Rêbertiyê perwerde û rêxistin dikin. Tevgera Azadiya Jin belavî her derê bûye. Jinên şoreşger bi Yekîneyên Parastina Jin pêşengtî ji şoreşa Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re kirin. Li Rojhilatê Kurdistanê bi dirûşma, "Jin Jiyan Azadî" jinan mohra xwe li dîroka berxwedana jinan xistin.
Di dîrokê de cara yekem bi têkoşîna PKK'ê re yekîne, tevgerên parastin û azadiya jinan bi awayekî xweser hatin avakirin. Jin li her qadê bi rengekî aktîf cihê xwe di nav têkoşîna mirovatiyê de digirin û ji her kesî re diyar dikin ku beyî jin ti civak, rêxistin û sazî nagihîjin armanca xwe. Ev tevahî geşedan û pêşveçûn bi fikir û keda Rêbertiyê li her qadê derketin holê. Jinan li her derê Kurdistan, Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê hêz, îrade û vîna xwe dan nasîn.
Bi kurtasî em dikarin bêjin ku jin berê weke guleke çilmisî bû. Bi keda Rêbertî û PKK'ê ew gul ji nû ve vebû, bû xwedî rengekî welê ku bala her kesî bikişîne.

## Ji Pênûsa Jin

### Ji jinên Sûriyê têkoşîna rûmetê tê xwestin

**Nehîr Pale**

Rûmeta jinan gelekî girînge, mirov nikare paşguh bike, lêgerîna heqîqetê ya ku behsa wê tê kirin bi vê yekê ve girêdayî ye. Dîrok lêkolîn kirin û ji nûve nivîsandin hemû ji bo gihîştina heqîqetê tê kirin û rûmeta jin lê were vegerandin. Berî rûmeta gelan were perçiqandin destpêke êrîşî rûmeta jinê kirine û heyanî ji destê wan hatiye pêlê kirine. Heman polîtîka niha li Sûriyê hemberî jinê tê kirin. Mêr bi riya ol û sîstema kaptalîzmê jinê diperçiqîne. Em dikarin dûr neçin û mînaka Heyet Tehrîr El-Şam (HTŞ) bidin. Li hemû bajarên Sûriyê yên ew serwerin bê hurmet nêzî jinê dibin. Ji destpêka têkçuyîna Sîstema Baasê û hatina HTŞ`ê ji berê zêdetir rêbazên qirêj li hemberî jinê têne bikar anîn. Li bajarên Sûriyê bi taybet Şam û Helebê jinan li camî û zanîngehan kom dikin, wan jinan bi cilên reş xwe pêçandine, wêneyên wan dikşînin û li ser medya dijîtal belav dikin. Şerekî taybet ê sar li hemberî jina Sûriyê didin meşandin û propeganda olperestiyê dikin.
Ciyê ku olperestî lê hebe li wêderê zayendperestî di asta herî jor de ye. Li Afxanistan rêbazên Talîban li ser jina Afxanî têne meşandin, niha HTŞ`ê vê yekê li Sûriyê jî li ser jinan ferz dike. Herî dawiyê dîmenek li bajarê Bo-Kemal ê Dêrazorê hatibû belav kirin. Endamên HTŞ`ê televizyon li ser erebeya xwe girêdane, qur`an vekirine û li ser pêşî, kêlek û dawiya erebê nivîs nivîsandine. Ew erebe jî li kolanên Bo-Kemal digere. Ew erebe rolê saziya polîsên exlaqî yên Îranê dileyîze û bi riya wan nivîsandinan jinê didin tirsandin. Hem jinan ditirsînin û gef li wan dixwin. Eger jin li gorî zagonên wan tevnegerin wê mîna çeteyên DAIŞ`ê li wan bikin.
Li Sûriyê di dema sîstema Baas de tu hesab ji mêr nedihat xwestin niha jî bi hatina HTŞ`ê re tûndî li ser jinê hîn zêdetir bûye. Rê û rêbazên bi jinê re têne bikar anîn wê bighîjin asta rêbazên DAIŞ`ê. Di encama van rêbazan de em dibînin ku jin têne revandin, tecawiz kirin, kuştin û îhaneta li wan tê kirin. Kuştina fîzîkî ne mîna ku rûmeta te were binpêkirin.
Li tevayî Rojhilata Navîn rûmeta jinê tê binpêkirin. Li Xeza, Afxanistan, Sodan, Sûriyê, Tirkiyê, Iraq, Îran û hwd, rojane rûmeta jinê tê binpêkirin. Ev pirsgirêkeke cidî ye û çarenûsa van jinan bi hev ve girêdayî ye. Kîjan jin li hemberî kiryarên civaka zayendperest û olperest bêdeng bimîne ew hîn zêdetir li pêşiya kuştin û tûndiya li ser jinê vedike.
Rûmeta xwe parastin têkoşîneke bê bedel nayê dayîn. Eger têkoşîn ji me re zehmet be û em pêdiviya wê nabînin, ev yek di me de hatiye çandin. Di dîroka jinê de diyar dibe ku jin napejirîne kesek rûmeta wê binpêbike û îradeya wê biperçiqîne. Ji bo vê yekê bi hezaran jin têkoşiyane. Wê demê bêdeng mayîn ne xwezaya jinê ye, di wê de hatiye çandin.
Eger em xwe birêxistin bikin, girîngiyê bidin perwerde, bixebitin wê têkoşîna rûmetê ji me re nirxekî mezin ava bike û li pêşiya hemû jinan vebike.

# Jin bi çandiniyê dibin xwedî aboriya xwe ya serbixwe

**Li bajarê Kobanê, jin kevneşopiya çandina baxçeyên fêkiyên werza havînê ne tenê ji bo pêwîstî, di heman demê de wek îradeyek dilsoziya bi axê re dibînin. Jin bi van rêbazan bi asanî debara malbatê birêve dibe.**



Li bajarê Kobanê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, jin baxçeyên fêkiyên werza havîn û zivistanê çêdikin û pêwîstiyên xwe pêk tînin. Jin ji bo hewceyî bazarê nebin û ji bo domandina jiyana xwe, bi axê hilberînê dikin.
Kobanê ya ku di aliyê çandiniyê de gelek dewlemend e, bi genim, ceh, cureyên beqlayan û bi taybetî jî bi baxçeyên fêkiyan tê nasîn. Li bajarê ku gelek darên zeytûn û fistiqan hene, piraniya gel û bi taybetî jî jin, bi çandiniyê re eleqedar dibin. Baxçevantiyê wek pîşeyek kevneşop ku ji demên berê heta îro aniye, didomînin.
Jin di destpêka meha Gulanê de li ber deriyê malên xwe baxçeyên havînê çêdikin. Pêwîstiyên xwe yên fêkî û sebze, ji vê derê pêk tînin. Di heman demê de amadekariyên zivîstanê jî dikin. Şitlên ku di meha Adarê de li serayan çandine, di meha Gulanê de di baxçeyan de diçînin. Di mehên havînê de berhemên dexl diçînin.

**'Em pêwîstiyên xwe ji baxçeyên xwe peyda dikin'**

Hatîce Îman a 67 salî ya ji gundê Minaze ye, rola jinan a di çandiniyê de bi van gotinan anî ziman: "Em wek xelkê gund, gelek girîngî didin çandiniyê. Çandinî bingeha debara me ye. Ji bo me jinan mijûlbûna bi baxçe ve, awayek jiyanê ye. Her berhema di baxçeyê me de bi hezkirin mezin dibe. Li ber deriyê her malekê biçûk jî be baxçeyek heye, ên ku eraziyên wan ên mezin hene sûd didin herêmê. Li ber deriyê mala min baxçeyek biçûk heye, tenê ji bo pêwîstiyên mala xwe ez diçînim. Ji bo zivîstanê ez amadekarî dikim. Ya zêde didim cîranan, ên xwedî pêwîstî û mirovên xwe yên li bajêr."

**'Ez bi hezkirin dixebitim'**

Hatîce Îman da zanîn ku du cûreyên wê yê baxçe, yê zivîstan û havînê hene û wiha got: "Eleqederbûna bi baxçe re baldariyek mezin divê. Avdan, paqijkirina giya, gubre û derman şert e. Ger lênêrînek baş were kirin, wê di nava 50 rojan de berhem were girtin. Tevî temenê xwe, ez bi hezkirin dixebitim. Berhemdayîna yekem, westandina min dide jibîrkirin. Dîtina hilberandina berhemên xwe têra min dike."

**'Ev çand ji dayîka me maye û em didin jiyîn'**

Halîsiye Emer bal kişand ser girîngiya rola jinên gund a di baxçeyên çandiniyê de û wiha got: "Her serê biharê, em li baxçeyên xwe sebzeyên cûda diçînin. Ji bo havînê berhemên nû dixwin û ji bo zivistanê jî em amadekariyên hişkkirina berheman û konserveyan dikin. Bi saya baxçeyê me pêwîst nake em ji bazarê tiştekê bikirin. Em sebze û pêwîstiyên xwe bi xwe peyda dikin."

'Baxçevanî pîşeya dapîra me ye'

Halîsiye Emer bal kişand ser dilsoziya bi axê re û wiha got: "Ax, ked û ava me heye. Bêyî muhtacî kesê em dijîn. Xebitîna di baxçe de tê wateya berhem û aramî. Têkiliyek taybet a jinan bi çandinî û axê re heye. Baxçevantî pîşeya dapîra me ye. Em ji dayîka xwe fêr bûn. Em vê kevneşopiya berê didomînin û em gihandina ji nifşên nû re didomînin." **NÛJINHA**



# 'Ziman û wêjeya kurdî bi xebatê pêş dikeve'

Hevseroka Koordîneya Wêjeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Narîman Evdikê diyar kir ku her çiqasî beriya şoreşê ji bo pêşketin û pêşveçûna ziman û wêjeya kurdî gav hatibin avêtin, lê qedexeya li ser ziman her tim rê li ber pêşketina wê digirt, lewra bi şoreşê re gavên girîng hatin avêtin, lê ev gav ne têrkerin û xebatên mezin pêwîstin.

**Navenda Nûçeyan**

Derbarê asta pêşveçûn û pêşketina ziman û wêjeya Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Hevseroka Kordîneya Wêjeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Narîman Evdikê bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:


**Asta pêşveçûn û pêşketina ziman û wêjeya kurdî di dema niha de, herwiha asta nivîskar û wêjevan û berhemên wan çiqasî li gorî guhertinên heyî ye?**

Piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û damezrandina Rêveberiya Xweser, hem berî damezrandina Rêveberiya Xweser jî, gavên gelekî hêja û giranbuha ji bo ziman û wêjeya Kurdî dihatin avêtin. Destpêkê di qonaxa perwerdê de ku êdî perwerede bû bi zimanê dayikê. Dema perwerde dibe bi zimanê dayikê, bi xwe re gelek tiştên giranbuha tîne. Mînak dema tu zanibe zarok di dibistanan de bi zimanê kurdî dixwînin, wê demê pêwîst dike ku weşangeriya berheman jî bi zimanê kurdî were çapkirin, rojnameyên bi zimanê Kurdî hîn dewlemendtir bibin. Herwiha sal bi sal panêl, semîner û gelek çalakiyên di derbarê danasîn, dîrok û asta pêşketina zimanê kurdî de berfirhetir û dewlementir dibe. Ev jî cihê kêfxweşî û şanaziyê ne. Weke mînak ji bo Cejna Roja Zimanê Kurdî îsal ji 1'ê Gulanê ve çalakiyên cûr bi cûr ji bo pîrozkirina vê rojê hatin lidarxistin, ev yek jî berê ji me re xewnek bû. Dema ku hemû gelê te yan piraniya gelê te ji bo pîrozkirina vê rojê li ser lingan be, wê demê nas bike ku êdî asta zimanê Kurdî pêş ketiye û gel lê xwedî derdikeve. Di Rojavayê Kurdistanê de zimanê Kurdî her dihate parastin, ji ber ku ê bi zimanê kurdî dixwendin û dinivîsandin hebûn, li kêlek wê her kes di malên xwe de bi zimanê kurdî diaxivî, lê di vê dawiyê de ziman di asta akadimîk de hate pêşketin, xwendin, nivîsandin, perwerde, rojnamegerî, ragihandin êdî di hemû aliyan de zimanê kurdî li pêş ket.

**Wêjeya kurdî berî şoreşê çawa bû û piştî şoreşê derbasî çi qonaxê bûye?**

Em li 15 salên dawiyê binêrin, dibe ku berî 15 salan jî wêjeya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê hebû. Lê wêjeyekî veşartî bû û di çarçoveyeke teng de dihate belavkirin weke pirtûk û hwd…Ji ber ku çapkirina pirtûkan bi zimanê kurdî qedexe bû, gelek nivîskar hebûn ku dixwestin berhemên xwe çap bikin, li Beyrûtê û deverên din bi rengekî veşartî çap dikirin, heta derbasî deverên me jî dikirin gelek astengî didîtin û rastî işkenceyê dihatin. Herwiha gelek nivîskarên me jî ketin zindanan de ji ber ku bi zimanê kurdî dinivîsandin, di serî de weke Bê Buhar çawa helbesta xwe ya yekê "Hebis û Zindanê" di zindanê de nivîsand. Ev hemû rêbazên rejîma Baas bû ku wêjeya kurdî tune û qedexe bike. Lê ev sîstem û şêwazên ku dihatin kirin, kîna di hundirê me de zêde dikir ku em hîn bêtir li ziman û wêjeya xwe xwedî derkevin. Di malan de fêrbûna zimanê kurdî dihate kirin û di malan de me berhemên kurdî dixwendin, ev beriya şoreşê bû. Lê niha em bînin destpêka şoreşê, berhemên ku beriya şoreşê çap bûne, ji me re bûn bingeh ku êdî em berdewamiya wê bikin.
Rewşa ku nû bi şoreşê re sazî û destgehên me yên weşangerî û çapkirinê vebûn heta 4 û 5 salan jî, tenê me berhemên nivîskarên xwe yên dema 90'î û berya 90'î de veşartî mabû, çap dikirin. Ji ber ku mixabin hin berhem di salên 90'î de hatibûn nivîsandin, di salên 2022 û 2023'an de nû hatin çapkirin. Ev yek jî dide xuyakirin ku em di qonaxên nû re derbas dibin. Tiştekî nû diafirînin, hêzekê nû çêbûye, lê ev berhem ne berhemên nûjenin, raste nû tên çapkirin, lê ji ber ku çapkirina wan qedexebû. Lewra divê em wan ber çav re derbas bikin û li wan xwedî derkevin. Di heman demê de pêwîste ku em zanibin ev ne asta wêjeyê ya niha ye. Li hemberî wê niha nivîsandina bi zimanê kurdî gelekî zêde dibe. Zimanê kurdî jî pranî di nava ciwanan de zêde dibe ku em lê binêrin berhemên kurdî yên ku salan e çap dibin, wekî mînak heger 30 berhem çap dibin 15 jê kurdî bin herî kêm 10 berhem jê ciwanan nivîsandiye, ji ber ku ciwanên me çavê xwe li ser zimanê kurdî vekirin, hestên bi zimanê xwe dikarin bi rengekê azad giftigo bikin. Lewra asta ziman û wêjeya kurdî niha gelekî baş bûye, mijarên ku niha ciwan giftigo dikin, gelekî başin, lê hîn ne têrkere û gelek kar û xebat hîn gereke, di heman demê de divê em qebûl bikin ku hêdî-hêdî em ber bi jor ve diçin, ne em di cihê xwe de rawestiyayîne û ne jî bi paş de vedigerin.






**Pirsgirêkên ku îro di xwendin û çapkirina berhemên kurdî de têne jiyankirin çi ne û ji bo ev pirsgirêk ji holê werin rakirin çi pêwîst e?**

Li vir pirsgirêkek heye ku ew kesên bi zimanê erebî dinivîsînin, tiştekî li ser nivîskarên ku bi Kurdî dinivîsînin nas nakin, ne jî weke şaxekî nivîskaran li wan dinêrin, ev jî cihê kêmasiyê ye. Lewra ji bo demên pêş xebatên pêwîst ew e ku perwerdeyên Kurdî ji nivîskarên ku bi zimanê erebî dinivîsînin werin vekirin. Da ku fêrî zimanê Kurdî bibin û bixwînin. Herwiha di vê qonaxa hestyar ku em têre derbas dibin gelek kar û xebat divê. Pêwîstî heye ku nivîskarên me hemû derbasî perwedeya bi zimanê kurdî bibin, nebin pisporên ziman, lê kêm zêde bi kurdî bizanibin bixwînin. Da ku zanibin kesên bi kurdî dinivîsînin çi dinvîsînin. Ya duyemîn pêwîstî heye ku Rêveberiya Xweser giştî û bi taybet Desteya Çand û Huner, Tevgera TEV-Çandê ya Mezopotamyayê herdû xwedî li nivîskarên ku bi zimanê kurdî dinivîsînin derkevin, girîngiyê bidin wan, ji wan re bibin hêz, hem jî piştgiriya nivîsên bi zimanê kurdî were kirin. Ya sêyemîn ku di malpera me ya çandê de ji bo nûçe yan jî belavkirina çalakiyan, girîngî ji zimanê kurdî re were dayîn û bi zimanê kurdî tê de were nivîsandin. Lê mixabin heta niha gelek malperê me hene tenê bi zimanê erebî dinivîsînin û heger zimanê kurdî û erebî bi hev re bin jî, erebî didin pêş zimanê kurdî. Ya dawiyê jî pêwîstî heye ku berhemên cîhanî hêdî-hêdî wergerî zimanê kurdî bibin, ji ber niha nifşên me yên nû derdikevin pranî ji wan tenê bi kurdî dixwînin, zimanê wan ê erebî têrê nakê. Ji ber wê erkê li ser milê me ku em karibin wêjeya cîhanî wergerî zimanê dayikê bikin.

## Têbînî



### Sînemaya Jinan li Rojava nebûye diyardeyeke gelêrî û civakî

**Kemal Necim**

"Sînemaya Jinan" tevger yan jî diyardeyeke hunerî û çandî ye ku afrîneriya sînemayê û hişmendiya civakê ya pirsgirêkên jinan tîne ba hev. Ev beşê sînemayê êdî bûye derfetek ji bo vegotina serpêhatiyên jinan li hemberî kevneşopiya sînemaya bi rengê mêran. Her wiha bûye alavek ji bo ji nû ve avakirina hişmendiya der barê rolên zayendî de.
Têgeha Sînemaya Jinan ne tenê tê wateya fîlmên ku pirsgirêkên jinan vedibêjin, lê belê di heman demê de tê wateya berhemên sînemayê yên ku bi nêrîna jinan hatine çêkirin. Ango jinan mijara filmê nivîsiye, jinan derhêneriya wê filkmê kiriye. Sînemaya Jinan nêrîneke cuda nîşan dide, berovajî nêrînên serdest ên derbarê jinan.
Sînemaya jinan bi geşbûna tevgerên femînîst di salên 1960 û 1970'an de derketin holê, bi taybetî li Ewropa û Amerîkaya Bakur, ku derhênerên jin kamere kirin amûrek ji bo derbirîn û berxwedanê. Bi giştî sînemaya jinan gelek mijar û pirsgirêkên jinan gotûbêj dike, weke tundiya nav malê û ya zayendî, azadiyên takekesî, zewaca bi zorê û cudakariya civakî, mafê fêrbûnê û kar, nakokiya di navbera kevneşopî û pêşketinên serdemê de, her wiha mijarên mîna nasnameya jinan û têkçûna psîkolojîk û HWD.
Bê guman dibe ku ev mijar hemû berê jî di sînemayê de hatibin pêşandan, lê ew pêşandan dê bi ziman û nêrîna mêran be. Ji ber ku sînemaya jinan xwe dispêre zimanekî sînemayî yê ku ji vegotinên mêran cuda ya. Di sînemaya jinan de nêrînek hundirîn a jinan heye, karekterên xweser diafirîne, şêwaz û formên cuda têne ceribandin û laşê jinan weke alaveke derbirînê ne weke alaveke pêşandana laş tê bikaranîn.
Ev qada sînemayê rastî gelek astengiyan tê, mîna nebûna piştgiriya darayî û ya saziyan, serdestiya mêran a li ser sectora sînemayê, paşguhkirina derhênerên jin û ya herî girîng jî bertekên civakî. Lê tevî wilo jî qada sînemaya jinan li seranserî cîhanê her diçe pêş dikeve, filmên jinan li mihrîcanên mezin têne pêşandan û xelatan werdigrin.
Wiha diyar e ku sînemaya Jinan ne tenê qadeke hunerî ye, lê belê çalakiyeke berxwedan û azadiyê ye. Ew nêrîneke alternatîf e ku deng û rengê resen ê jinan nîşan dide.
Li Rojavayê Kurdistanê di 10 salên dawî de hewl û xebatên ji bo avakirina sînemaya Jinan geş bûne, ev xebat bi piştgiriya hin saziyan tê pêşxistin mîna SîneJin a Rojava. Hunera sînemayê bi giştî û ya sînemaya Jinan bi taybet li Rojava nebûye diyardeyeke gelêrî û civakî. Lewma divê di vê mijarê de plansazî û xebateke diyar û çalak hebe. Di hefteya derbasbûyî, ji bo geşkirin û piştgiriya sînemaya jinan, li bajarê Qamişlo Mîhrîcana Nûjiyan a Fîlmên Jinan hate lidarxistin. Helbet ev hewldaneke girîng e û rê li pêşiya vê hunerê vedike ku Rojava bibe pêşenga sînemaya Jinan a bi zimanê Kurdî.
Tişta xuya bû di vê mihrîcanê de ku xebat û çalakiyên çandî û hunerî ên di çarçovaya bernameya mihrîcanê de hatin lidarxitin ji pêşandana filman bêhtir kete rojeva xelkê. Ango diviyabû ku ew çalakî xuru ya sînemayê be, ne ya pêşandana karên destan ên jinan, pirtûkan û şahiyên mûzîk û stranan ba.

# Di mijara Civaka Exlaqî û Polîtîk de; Kurd

**Esma Mistefa/Qamişlo**



Li gorî ku hatiye tesbîtkirin, di civaka neolotîk de hemû nirx û pîvanên civakê xwe disipêrin bingehên exlaqî û mirovî. Rûxmî ku tê de beşeriyet û hişmendiya wê ewqas pêş neketiye jî lê di aliyên parastina pîvan û nirxên civakî de xwedî bingeh bûn. Ji vê nendika civakî bigre em dikarin bêjin û piştrast bikin ku civaka destpêkê a xwazayî li ser bingeha nirxên polîtîk û exlaqî hatiye avakirin. Dema em bixwazin mijara avabûna civaka polîtîk û exlaqî bigrin dest, ne weke ku ji demeke nêz de hatiye avakirin û ev diyarde bi demê re pêşketiye. Civaka polîtîk û exlaqî ji destpêka mirovahiyê ve heye û weke rêgezeke bi kok her ku çûye bi pêşketina serdemê re pêş ketiye. Dema ku em di roja îro de pêwîstiya bi nirxandin û vegera li vê civaka bi kok û bingeh dibînin. Ev yek ji ber ku bi pêşketine serdemê re ji cewherê xwe hatiye derketin û weke pîvaneke civakî û mirovî nehatiye parastin. Helbet ev yek jî vedigere pêşketina serdema kapîtalîzmê û serweriya sermayeyê li ser hemû pîvanên civakî yên destpêkê.

Pergala serdest bi taybet mijara polîtîka ji destê nirxên mirovî û civakî girt û weke ku ne rêgezeke exlaqî û mirovî ji destpêka avabûna mirovahiyê re ye. Ev yek bi taybet ji destê civakê girt û kir ayidî xwe, dibe ku em pirs bikin çima kir ayidî xwe?!

Zihniyeta serdest bi pêşketinên xwe re hemû pîvan, rêgez, pêşketin û afrîneriyên ku bi destê dayîka xwedawend hatine dîtin û bûne malê civakê; ji dest girtin û ew pêşketin li gorî sazûmaniya zihniyeta xwe birêvebirin. Zihniyet û pergala sermaye hêdî hêdî ew destkeftî ji xwe re bikar anîn. Pergalek netew-dewlet a kapîtalîzim li ser tunekirina rola sereke a civak û pîvanên mirovahiyê xwe saz dike. Divê em bizanibin ku kapîtalîzim nikare xwe bi civakeke xwedî zanebûn û têgihiştî re mayînde bike. armanca wan a sereke pûçkirina mirov di aliyê serwextbûna li hember paragalê ye. Ênaxwa ger civakeke, nifşek xwedî taybetmeniyên têgihiştî yên derbarê sîstem û pergalê be, helbet wê serî rake. Da ku tu kes li hember siyaseta ku birêvedibin serî raneke û nizanibe. Yek ji xisûsên ku ji destê civakê girtine û weke ku ne ji kerê civakê ye bizanibe, ew jî siyaset bû.

Mijara axlaqê jî xwe dispêre gelek aliyên berfireh yên sîstemê ku çawa bi demê re exlaq bûye zagon. Bi kêm gotinan em dikarin bêjin. Li cihê ku exlaq nîne, zagon heye. Pergalê dît ku civak û mirovahî ber bi tunebûna exqî ve diçe ku li dewletên Rojavayî ev yek herî zêde belav bûye ye. li şûna exlaq a ku xisletekî mirovî û di hundir her însanekî de heye, bi rêya zagon û baceyan feriz dikin. yenî însan û civak welê lê hatiye ku êdî ji xwezaya xwe a mirovahiyî derketiya hetanî ku exlaq bi zorê tê ferizkirin.

**Hin lêkolîn û nirxandinên ku hatine kirin wiha dibêjin:**

Ji bo ku civaka kurdan avahiyeke exlaqî û polîtîk ava bike, divê beriya her tiştî li ser nirx û pîvanên hevpar li hev bikin. Divê prensîbên bingehîn ên exlaqî bên diyarkirin yên ku beşên cuda yên civakê dikarin tê de beşdar bibin û ev prensîb bên belavkirin ji pergala perwerdeyê bigire heta amûrên medyayê û li gelek qadan. Pejirandina van nirx û kesan teşwîq dike ku di asta civakî de mirov hesta xwe ya exlaqî ya kesane parve bikin û biparêzin.

Hewldana siyaseta kurdan a ji bo avakirina civakeke exlaqî û polîtîk didome. Ev hewldan ji bo siberoja kurd û Tirkiyeyê nîşaneya hêviyê ye. Zextên dîrokî û siyasî yên li ser kurdan bûne sedema têkoşîna parastina nasname û mafên wan. Ev têkoşîn, bi daxwaza avakirina civakeke li ser nirxên exlaqî yên wekî edalet, wekhevî û azadiyê ve girêdayî ne. Çanda kurdî girîngiyê dide nirxên wekî hevgirtin, kolektîf û avakirina civakeke adil. Ev nirx faktoreke girîng e û armanca siyaseta kurdan a avakirina civakeke exlaqî û polîtîk e.

Civaka exlaqî û polîtîk, modeleke civakê ye ku tê de ferd hem nirxên exlaqî diparêzin hem jî li ser van nirxan nîzameke siyasî diafirînin. Ev têgeh misoger dike ku endamên civakê xwediyê avahiyeke civakî ne û li dora nirxên exlaqî hatine çêkirin ku ev nirx di pergala polîtîk de bi bandor in.

**Taybetmendiyên sereke yên civaka exlaqî û polîtîk ev in:**

Nirxên Exlaqî yên Hevbeş: Rêzik û nirxên exlaqî hene ku ji hêla beşeke berfireh a civakê ve têne parvekirin û pejirandin. Ev nirx rêberiya tevgera kesan û xebata giştî ya civakê dikin.

Pergala Hiqûqî ya Adil: Prensîba serweriya hiqûqê tê pejirandin û qanûn ji bo hemû kesan bi awayekî wekhev têne sepandin. Pergala dadweriyê piştrast dike ku nirxên exlaqî têne parastin û bicihkirin.

Demokrasiya Beşdar: Avahiyeke siyasî heye ku tê de kes bi awayekî aktîf beşdarî pêvajoyên biryardayinê dibin. Demokrasiya beşdar rêyê li ber wergirtina wan biryaran vedike ew biryarên ku nirxên giştî yên exlaqî yên civakê nîşan didin.

Edaleta Aborîyê: Wekheviya aborî û edaletê di civakê de pêk tê. Pirsgirêkên wekî peydakirina pêdiviyên bingehîn, derfetên wekhev û têkoşîna li dijî xizaniyê girîng in.

Çanda Ragihandin û Diyalogê: Di civakê de nêrîn û baweriyên cuda tên qebûlkirin û hawirdora diyaloga vekirî tê teşwîqkirin. Ev çand rêyê li ber nakokiyên civakî digire û dibe alîkar ku têgihiştineke hevpar pêş bikeve.

**Armanc**

Armanca civaka exlaqî û polîtîk ew e ku kes jiyaneke li ser nirxên adil û exlaqî bijîn, ku tê de ne tenê berjewendiyên xwe, di heman demê de berjewendiyên giştî yên civakê jî biparêze. Ev modela civakê nîzameke wisa temsîl dike ku tê de erk û mafên exlaqî hem di asta ferdî, hem jî di asta kolektîf de bi awayekî hevseng têne parastin. Civak, di civaknasiyê de yek ji qadên sereke yên lêkolînê ye, ne tenê wekî kombûna kesan, di heman demê de wekî avahiyekê ye ku li dora hin nirx û rêzikan hatî çêkirin. Di vê çarçoveyê de têgeha “civaka exlaqî û polîtîk” modeleke civakê ye ku tê de ferd hem nirxên exlaqî diparêzin û hem jî li ser van nirxan nîzameke siyasî diafirînin. Ji ber vê yekê, bi rastî jî civakeke wisa gengaz e? Ji bo pêkanîna vê utopyayê çi şert û merc lazim in? Ya duyemîn jî, pêwîst e civaka kurdan sîstemeke hiqûqî ya bihêz û adil ava bike. Prensîba dewleta hiqûqê di parastin û bicihanîna nirxên exlaqî de roleke bingehîn dilîze. Sîstema ku tê de her kes xwedî mafên wekhev be û zagon bi awayekî adil li ser hemû kesan were sepandin, dibe alîkar ku dadmendiya civakî dabîn bike û jîngeheke pêbaweriyê di navbera kesan de peyda bike.

Lê modelên demokrasî û rêveberiya beşdariyê ji bo civaka kurdan jî girîng in. Tevlîbûna çalak a kesan, di pêvajoyên biryardayinê de, ne tenê nûnerên siyasî di heman demê de ji tevahiya civakê re dihêle ku li gorî nirxên exlaqî biryaran bide. Demokrasiya beşdar rêyê li ber kesan vedike ku berpirsiyariya teşekirina paşeroja xwe hilgirin û ev jî yekitiya civakî xurt dike.

Dadmendiya aborî û refaha civakî jî ji bo pêkhateyeke exlaqî û polîtîk a civaka kurdan pêwîst e. Pêkanîna hemû beşên civakê, ji bo dabînkirina pêdiviyên xwe yên bingehîn, misogerkirina wekheviya derfetan û kêmkirina pirsgirêkên weke xizaniyê rêyê li bre wê çendê vedike ku takekes jiyaneke bi exlaq û polîtîk bijîn. Kêmkirina newekheviyên aborî, hevgirtina civakî zêde dike û baweriya di navbera kesan de xurt dike.

Çanda ragihandin û diyalogê, di avakirina pêkhateyeke exlaqî û polîtîk a civaka kurdan de roleke girîng dilîze. Civakeke ku tê de nêrîn û baweriyên cuda bên qebûlkirin û hawîrdora diyaloga zelal û avakar bê teşwîqkirin, ji bo parastin û pêşxistina nirxên exlaqî xwedî girîngiyeke mezin e. Ev cure çand pêşî li nakokiyên civakî digire û dibe alîkar ku têgihiştineke hevpar pêş bikeve.

Di encamê de, bi şert û mercên guncaw, avahiyeke siyasî ya exlaqî ji bo civaka kurdan dikare bibe rastî. Nirxên hevpar ên exlaqî, pergala hiqûqî ya adil, demokrasiya beşdar, edaleta aborî û çanda ragihandinê ya xurt hêmanên bingehîn ên afirandina vê pêkhateyê ne. Bi berhevkirina van hêmanan mirov jîngeheke wisa diafirîne ku tê de ne tenê berjewendîyên xwe, berjewendîyên giştî yên civakê jî diparêze ji bo ku civakeke adiltir û exlaqî pêkan be.

# Kovara Gaziyên şer ‘Berxwedan Jiyan e’ derket

**Navenda Nûçeyan**

**Hejmara Heftemîn a Kovara ‘Berxwedan Jiyan e’ ya Federasyona Gaziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derket.**

Hejmara Heftemîn a Kovara ‘Berxwedan Jiyan e’ ya Federasyona Gaziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi sernavê ‘Şehîdên me soza me ya rûmet û mirovahiyê ne’ derket.

Di hejmara heftemîn a Erebî û Kurdî de nirxandina Rêber Apo ya “Di nava neteweya demokratîk de kesayetên azad û jiyana komun a demokratîk”, nivîsên têkildarî şehîdên meha Gulanê, her wiha civîn, semîner û çalakiyên gaziyên şer ên hatine lidarxistin cih digirin. Kovara gaziyên şer a weke bultena leşkerî, bîrdozî û siyasî tê amadekirin, her du mehan carekê bi zimanê Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê weşandin.

Di beşê ji bo xwendevanan a Kovara ‘Berxwedan Jiyan e’ wiha tê gotin, “Îro hê zêdetir hatiye dîtin û fêmkirin ku Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rê dide ber mirovatiya azadîxwaz û ji bo jiyana bi sedê salan mirov bi hesreta wê ne model û mînakeke herî bi qîmet û pîroz e. Ev helbet nîşan dide heta çi astê bîrdozî, felsefe û ramanên Rêber Apo ji bo jiyana azad û wekhev a gelan çiqasî pêwîst in. Lewma ya dikeve ser milên me ew e, em şoreşa bi xwîna hezaran şehîdan û berdêlên giranbiha yên gaziyên şer
ava bûye heya dawiyê biparêzin.”






# ‘Gavên dîrokî ne û divê bersivandin jî efsûnî be’

Endamê Desteya Edaletê ya Parlementa Tirkiyê û Parlamenterê Colemêrgê DEM Partiyê Onur Dûşûnmez bibîrxist ku ev pêvajo erkê civakê ye ku divê were serxistin û got: “Tevgera Azadî û Rêber Apo erkên xwe yên dîrokî pêk anîn, niha dora hikumetê ye."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Piştî banga Rêber Apo ya dîrokî PKK kongireya xwe ya 12’emîn di navbera 5 û 7’ê Gulanê de lidarxist. Li tewî hemû hewildanên Tevgera Azadiyê û Rêber Apo ti gavên berbiçav nehatin avêtin û tecrîda li ser Reber Apo hîn jî didom e.

Di derheqê pêvajoya dawî ya Rêber Apo daye destpêkirin û gavên ku pêwiste bên avêtin, endamê Desteya Edaletê ya Parlementa Tirkiyê û Parlamenterê Colemêrgê yê Partiya Wekhevî û Demokrasiyê (DEM Partî) Onur Dûşûnmez ji rojnameya me re axivî.

**‘Rêber Apo bi banga xwe hincetên di destê şerxwazan de girt’**

Onur Dûşûnmez da xuyakirin ku Rêber Apo bi berpirsyariyeke dîrokî rabû, lê hikumeta Tirkiyê hîn tu gav neavêtine û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Banga ku ji hêla Rêber Abdullah Ocalan ve di 27’ê Sibata 2024’an de hatiye kirin ne tenê peyamek bû, lê di bingeh de peyameke dîrokî bû. Ev bang ji bo her kesî, ji tevgera azadiyê bigire heya dewlet, parlemento û avahiyên siyasî yên wekî me, erkekî berpirsiyariyê bû.



Di vê pêvajoyê de, tevgera azadiyê bi erkê xwe rabû: Pêşî agirbest îlan kir, dû re jî hebûna xwe ya rêxistinî bi dawî kir. Ev gavek pir wêrek û dîrokî bû ji bona aştî û çareseriyek demokratîk. Wekî Partiya DEM, me bi gel re civîn li dar xistin, di civînên bi beşdariya berfireh li Kurdistan û metropolên Tirkiyeyê de me guh dan raman û daxwazên gel. Me bi partiyên siyasî re têkilî danî û pêşniyarên xwe pêşkêş kirin. Me van hemû pêşketinan bi rêya Heyeta Îmraliyê ji Rêber Abdullah Ocalan re ragihandin. Em ji berpirsiyariya xwe ya siyasî ya ji bo pêvajoyê haydar in û bi vê hesta berpirsiyariyê tevdigerin. Lêbelê, mixabin divê were gotin ku baskê dewlet û hikûmetê hîn jî israr dikin ku di vê pêvajoyê de gavên pêwîst neavêjin. Bendewariya hevpar a civakê ew e ku Rêber Öcalan vê pêvajoyê di şert û mercên azad û tendirûst de bi rê ve bibe. Rastiya ku ev bendewarî nehatiye bicihanîn, di civakê de li ser pêvajoyê bêbaweriyek cidî çêdike. Her wiha, yek ji gavên sereke ku divê dewlet bavêje ev e ku girtiyên nexweş bigihîjin dermankirinê û misoger bike ku ew bêyî ku dereng bibe demildest werin berdan. Lê, astengkirina berdana girtiyên ku cezayên xwe temam kirine bi rêya rêveberiyê û desteyên çavdêriyê hem ji aliyê zagonî ve û hem jî ji hêla exlaqî ve nayê pejirandin. Beşên mezin ên civakê ji ber van pêkanînan dibin qurbanî. Niha ji bo dewletê pêdivîyek dîrokî ye ku berpirsiyariyên xwe bêyî dereng bicîh bîne.”

**‘Pêwîst e demildest gavên erenî ji aliyê hikumetê ve bê avêtin’**

Onur da xuyakirin ku gotinên Dewlet Bahçelî girîng bûn, lê nakevin merîyetê û wiha domand: “Rolên ku parlamento divê bigire li ser milê xwe di banga Rêber Apo û biryarên kongreya 12’emîn ya PKK’ê de bi zelalî hatine destnîşankirin. Heta MHP, ku hevkarê Tifaqa Gel e, demek dirêj e diyar kiriye ku parlamento divê di vê pêvajoyê de rolek bilîze. Tevî vê yekê, mixabin, heya niha tu gavek berbiçav ji parlamentoyê re nehatiye pêşve birin. Mixabin, rêziknameya bingehîn ya ku tê payîn ku were Komîsyona Edaletê, ti rêziknameyek li gorî rihê pêvajoya aştiyê nagire nav xwe. Lê, tiştê ku bi lezgînî pêwîst e ev e ku newekheviyên di zagonên zagonî de ji holê werin rakirin, rê li ber azadkirina girtiyên nexweş û siyasî were vekirin, û astengiyên li ser siyaseta civaka sivîl werin rakirin. Daxuyaniyên Devlet Bahçeli yên derbarê avakirina desteyekê ku di derbarê pêvajoyê de û helwesta piştgir a Serokê parlamentoyê Numan Kurtulmuş a piştewanî dibe ku nîşanek ji bo destpêkek nû di vî warî de be. Ya girîng niha ev e ku ev deste were avakirin û bêyî windakirina demê dest bi xebata xwe bike. Xebata desteya ku were avakirin dê dilsoziya vîna li ser asta Parlamentoyê nîşan bide. Em vê pêvajoyê bi baldarî dişopînin û amadebûna xwe ya beşdarbûnê diyar dikin.”

**‘Erkê me hemûyane em pêvajoyê bi ser bixin’**

Dûşûnmez got ku gavên Tevgera Azadiyê yên ji bona çareseriyê dîrokî ne, pêwiste bê bersivandin û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Daxuyaniya PKK’ê di Kongreya xwe ya 12’emîn de ku têkoşîna xwe gehiştandiye qonaxekê nû û pêvajoya şerê çekdarî dawî kir, ev gaveke dîrokî ye. Ev gav pênaseya vîna azad ya ji bo aştî û çareseriyek demokratîk dide nîşan dan. Di pêşiya desthilatiyê de, ti hincet neman. Hêviyên hemû beşên civakê eşkere ne. Divê dewlet vê gavê bêbersiv nehêle û divê rê li ber aştiyek mayînde veke. Wekî Partiya DEM, em di her warî de rola xwe dilîzin. Me pêşniyarên xwe yên pêşnûmeyê derbarê rêziknameyên ku divê di makezagonên cezayî de werin çêkirin de pêşkêşî hikûmetê kirin. Me daxwazên ku me ji civakê wergirtin bi mûxatabên xwe yên rasterast ên li Parlamentoyê re parve kirin. Ger ev pêvajo dereng bikeve, dê ne zêde zehmet be ku yên ku dixwazin pêvajoyê têk bibinn, wekî pêvajoyên debasbûyi be. Li Tirkiyeyê jî, li hember vê zimanê qirêj û polîtîkayên tund yên ku ew kesên ku bi xwe şer xwedî dikin dixwazin belav bikin, divê em zimanê aştiyê û siyaseta çareseriyê bê hembêz kirin. Em ê têkoşîna xwe ji bo anîna aştî, wekhevî û azadiyê ji vî welatî re bidomînin. Hewldanên me dê berdewam bikin heya ku em çareseriyek li ser bingeha daxwazên civakê ava bikin.”

# ‘Tirkiyê bi wêrekî nêzî pêvajoyê nabe’

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Endamê Rêveberiya Kongreya Îslama Demokratîk, Ebdilkirîm Sarûxan da zanîn ku Tirkiyê bi guman û bêwêrekî nêzî pêvajoyê dibe û got, “Bi banga dîrokî, Rêber Apo bû aktorê çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn. Divê dewleta Tirk jî gavan bavêje ji bo pêvajo beravêtî nebe.”**

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk rojeva herî ku li ser asta Kurdistan, Tirkiyê û Tevahiya cîhanê tê nîqaşkirin e. Li milekî banga Rêber Apo, nameyên wî, êrişên li ser PKK’ê û ji milekî din ve çavdêriya tevahiya aliyan di mijara gavavêtina Tirkiyê ji bo pêvajoyê. Derbarê heman mijaran de endamê Rêveberiya Kongreya Îslama Demokratîk, Ebdilkirîm Sarûxan bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk heya çi radeyê bandor li tevahiya cîhanê kir û guhertin bi xwe re anî?**

Bangewaziya ku Rêber Apo di 27’ê Sibatê de kir, gaveke pir girîng û dîrokî bû, ev bang jî di encama têkoşîna 50 salî de pêk hat. Rêber Apo ji bo civakeke azad û demokras, hem jî çareserkirina pirsgirêka Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê gelek salan têkoşiya. Li aliyekî dewlata Tirk di serî de Devlet Bahcelî yê herî nijadperest û wî qet rojekê qebûl nedikir ku peyva ‘Kurd’ were gotin, anî ziman ku bila aştî di navbera Kurd û Tirkan de çêbibe. Ev gotin û helwestên Devlet Bahcelî ji ramanê Rêber Apo bûn, ji salên 1990’î ve Rêber Apo ramana aştî û dawîkirina şerê çekdarî daye destpêkirin, lê dewleta Tirkiyê qebûl nedikir û ti serok yan pêşengên Tirkan ne wêrek bûn ku xwe bixin bin vî barê giran. Lê herî dawî ew jî ketin wê baweriyê ku divê pêvajoyeke aştiyê dest pê bike. Bi banga ku Rêber Apo da, ruxmî ku di nav dîwarên zindanê de ye, dikarîbû rewşa Tirkiyê bide guhertin û bandoreke mezin li cîhanê bike. Bi banga Rêber Apo re Neteweyên Yekbûyî daxuyanî da û got Rêber Apo gaveke baş avêt ku bangeke bi vî rengî kir. Di heman demê de jî dewletên din weke Almaniya, Ferensa, Birîtaniya, Amerîka, Rûsya û hin dewletên Ereban jî daxuyanî dan. Êdî bi riya daxuyaniyan tekez bû ku ramanên Rêber Apo di warê lêgerîna çareserkirina pirsgirêkan de xwedî kesayeteke bi bandor e herwiha dikare bibe rêbeberê çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn.

**Tevî banga Rêber Apo û lidarxistina Kongreya 12’an a PKK’ê jî hîna êriş li ser Qadên Berxwedanê ji hêla artêşa Tirk ve tên domandin, gelo sedem çi ye?**

Li Tirkiyê gelek alî hene, hin ji wan alîgirê çareseriyê ne û hin ji wan alîgirê xerabiyê hen û naxwazin ev pêvajo negihêje serî pê re jî şer bidome, ev alî li berjewendiyên xwe digerin. Yên ku xizmetê di pirsgirêkên di navbera Kurd û Tirkan de dibînin, naxwazin pêvajo biencam bibe, ji ber wiha em dibînin ku hîna êriş li ser PKK’ê hîna ranewestiyaye. Rawestandina şerê li ser Qadên Berxwedanê jî gaveke girîng e ku divê hikumeta Tirkiyê Bavêje. Dewleta Tirk bi dirêjahiya sedsalê xwest gelê Kurd qir bike, lê planên wê tev vala derketin, berevajî vê Kurdan parastina xwe kirin û karîbûn bibin xwedî proje û nerîn. PKK’ê bi pêşngtiya Rêber Apo di gelek pêlan re derbas bû û di Rojhilata Navîn de bû aktoreke hêzkar, li dijî DAIŞ’ê, şerê dagirkeriya Tirk û planên li dijî wê hatin meşandin, berxwedaniyeke mezin kir. Dewleta Tirk gelek hêzên navdewletî bi ser xwe de kişandin û bi navê terorê şerê PKK’ê kir, bi dirêjahiya têkoşîna PKK’ê re, dewleta Tirk nikarîbû vê tevgerê û gelê Kurd tune bike. Lewma hikumeta Tirkiyê ji lewazbûna xwe û rewşa Rojhilata Navîn tê re derbas dibe, neçar bû ku tevlî Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bû.



**Ji bo encamkirina pêvajoyê pêwîst e dewleta Tirk çi gavan bavêje?**

PKK’ê êdî bi Kongreya xwe ya 12’an xwe fesix kir, ev yek jî li ser banga Rêber Apo bû, êdî Rêber Apo û PKK’ê erka xwe pêk anîn, niha jî top li cem Tirkiyê ye ku gavan ber bi wê ve bavêje. Di serî de divê hikumeta Tiriyê destûrê xwe biguherîne û li gorî destûrekî nû tevbigerin, li aliyekî din jî deriyê diyalogê bê vekirin, şer êrişên li ser çiyayên Kurdistanê bi dawî bibin da ku kadroyên PKK’ê xebata xwe ji qada leşkerî veguherîne qada siyasî û diplomasî. Dewleta Tirk ji bo gavavêtin gelekî giran tevdigere û ew bi wêrekî nêzî pêvajoyê nabe û nayê guhertin, lê divê Tirkiyê baş bizanibe ku dema guhertinê hatiye, pêlên guhertinê di Rojhilata Navîn de bi lez tevdigerin, eger dewleta Tirk ne li gorî van guhertinan bimeşe, wê Tirkiyê parçe bibe û lawaztir bibe, ev pirsgirêka serokên dewletên Rojhilatî ne, desthilatdar in û gelekî berjewendîparêz in. Kurd parçebûnê naxwazin, daxwaza wan jiyaneke demokrasî ye ku hemû mafê wan tê de parastî be, lewma jî da ku pêvajo bi ser bikeve divê dewleta Tirk siyaseta xwe ya li hemberî Kurdan biguherîne. Kurd nema Kurdên berê ne, eger di serdemên bûrî de hikumeta Tirkiyê dikarîbû gelê Kurd bixapîne îro nikare, eger planên xapînok bimeşîne ew ê bi bin bikeve, ji ber ku doza Kurdî li hemû cîhanê hatiye naskirin, hem jî alîgirên gelê Kurd li ser asta cîhanê çêbûne. Eger dewleta Tirk gavan ji bo pêvajoya Aştî û Civaka Demoratîk neavêje wê ev pêvajo beravêtî bibe, pêwîst e gav ji hêla Tirkiyê bên avêtin û dewletên navbênkar bi awayekî fermî di navbera Kurd û Tirkan de mîsaqeke fermî derxin.

# ‘Nenavendîbûyîn rêya çareseriyê ye’

**Endama Navenda Firatê ya Lêkolînan Çinar Salih diyar kir ku Sûriyê niha ji nû ve xwe ava dike, herwiha Sûriyê ji gelek pêkhateyan pêk tê, ji bo wê jî girîng e ku ev pêkhate bi hestên ku ew jî parçeyên ji Sûriyê ne jiyan bikin û jiyankirina wê bi sîstema nenavendî pêk bê.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Pirî caran mijara nenavendîbûn bi awayekî şaş wekî ku gefeke, tên fêmkirin. Yan wekî ku dibe mijara parçebûn, dagirkerî, lawazî an jî destwerdanê, li şûna ku bibe faktorên hevgirtin, rêxistinkirin û hêzê. Nenavendîbûn bi awayekî mezintir bi kûrahî û cidî û bi awayekî kêm ji îdeolojîk. Eger hizira di nava gelê Sûriyê de belav bûye ku nenavendîbûn gefê li nasnameyan dixwe, dema hatiye ku were ceribandin, ango nenavendîbûn destpêka sereke ya avakirina nasnameyan ya herî zêdetir hevgirtî û aram e. A girîng di hizira nenavendîbûnê de, ew e ku nêrîna ji bo birêvebirina jiyanê, kar, hilberandin û jiyan li herêmê, nenavendî bi çavê faktorên xwecihî be. Nenavendîbûn beşek ji dînamîkên siyasetênên giştî û rêveberiya jiyana civakî ye. Bi qasî ku taybetiyên etnîkî û olî û hwd girîng in, pêwendiya civakî û pêkvejiyana neteweyî jî girîng e. Nenavendîbûn metirsiyekê li ser nasnameya Sûriyê çênake, berovajî wê civakê ji mêtinkarî û zordestiyê diparêze.

**Rêveberiya Xweser teşeyeke nenavendîbûnê ye**

Nevnavendîbûn gelek teşeyan digre nava xwe ji wan fedralîzim, rêveberiya xweser, rêveberiya xwecihî û hwd… gelek şêweyên nenavendîbûnê hene. Mînaka wê bi avakirina teşeyek ji teşeyên nenavendîbûnê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser e. Bi avakirina Rêveberiya Xweser re gelek pêşketinên berbiçav di hemû aliyan de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin kirin, ji wan jî jiyana hevbeş a di navbera pêkhateyên cuda de û hevgirtina civakê. Di heman demê de Rêveberiya Xweser sîstema herî guncaw a ji bo pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Ji ber ku îradeya gelan pêk tîne û wekheviyê dixe navbera hemû pêkhateyan de. Herwiha bêyî gel tu rewabûn ji çi destûr û pêşeroja li Sûriyê re tune ye.

Derbarê Sîstema nenavendî, endama Navend Firatê ya Lêkolînan Çinar Salih ji Rojnameya me re axivî.

Çinar Salih eşkere kir ku Sûriyê dewleteke li ser kavlên Osmaniyan hatiye avakirin û wiha got: “Sûriyê dewleteke ku li ser kevlên hilweşandina impratoriya Osmaniyan hat avakirin, beriya wê tiştek bi navê Sûriyê wek dewlet tinebû. Piştre Ferensa hat li Sûriyê cih girt û dema ku Ferensa ji Sûriyê derket, hikumeteke bin kontirola xwe li Sûriyê ava kir. Ji Ferenasa heya dema hatina baas, karektêrên dewletê giştî hat guhertin ku bû netedewletekî gelekî teng, hem jî netewdewletekî ne wekî dewletnetewên derdora xwe. Ji ber ku Ferensa jî dewletnetew bû, lê pîvanên wan hebûn. Lê Sûriyê bi pîvanên irfî meşiya û di nava xwe de zagon û destûr negirt. Tenê Sûriyê dewleteke leşkerî bû û piştgiriya xwe giştî dabû ser istixbartbûnê, Sûriyê dewleteke bi vî rengî hatibû çêkirin. Li hemberî vê dewletê tiştê herî girîng ew bû ku tu carî Kurdan hestên ku ew parçeyeke ji vê dewletê ne jiyan nekirin. Hem jî hestên ku xwe di nava vê dewletê de digirin nedîtin ev heya hilweşîna baasê jî dihat jiyankirin.”

**‘Girîng e ku pêkhateyên Sûriyê binesaziya Sûriyê ji nû ve ava bikin’**

Çinar Salih eşkere kir ku Sûriyê niha di asta destpêkê de ye û wiha pê de çû: “Piştî hilweşandina rejîma Baas, êdî desthilateke nû çêdibe. Desthilata nû jî hîna saz nebûye û gelek guman li ser hene. Sûriyê niha di asta destpêkê de ye û ji nû ve ji bermahiyên xwe derdikeve. Sûriyê ji gelek pêkhateyan pêk tê ku ew jî ev in; Kurd, Diruz, Elewî, Mesîhî, Ereb û hwd... ji bo wê jî girîng e ku ev pêkhate bi hestên ku ew jî parçeyên ji Sûriyê ne jiyan bikin, hem jî bi hev re binesaziya Sûriyê jinûve ava bikin, ev yek jî wê bi rêya sîstema xweserî an nenavendî pêk bê. Ji ber ku bi terzê berê ne pêkane ku berjewendiyê dewletê li ser berjewendiyên civakê were avakirin. Ji ber dema dewlet berjewendiyê xwe biparêze, berjewendiyên gel û pêkhateyan tê jibîrkirin. Bi vê yekê wê dîsa gel û dewlet ji hev qut bibin, ji bo ku ev pêk neyê, nenavendî dermanê wê yê herî başe.”



**‘Bi hişmendiyeke tundrew Sûriya nû nayê avakirin’**

Çinar Salih anî ziman ku nenavendîbûn ne cûdahiye û wiha got: “Nenavendî ne cûdahiye, lê kesên li derdor desthilatdariyê vê yekê ji xwe re dibêjin. Berovajî wê nenavendîbûn pêşxistin û lezbûne. Di deman niha de ya pêwîst jî ew e ku guhertina sîstema navendî were kirin û çareserî ji bo vê yekê nenavendîbûne. Hem ji bo Sûriyê bi taybet avakirina Sûriyeke demoratîk û sîstemeke nenavendî di roja îro de girînge. Ji ber bi hişmendiyeke tundrew Sûriya nû nayê avakirin, hem em bêjin dewletên derdor Sûriyê û pêkhateyên di hundir Sûriyê de jî li dijî hişmendiya tundirewin.”

**‘Mafê civakê di garantiyê de be’**

Çinar Salih axaftina xwe wiha bidawî kir: “Avakirina Sûriya nû hewcedarî civakê ye ku ew civaka di hundir wê de li gorî xwestekên xwe Sûriyê ava bikin ku mafê wan di garantiyê de be.”

# Siyaseta Demokratîk li Pêşengên Xwe Digere

**Sînan Cûdî**

Teoriya siyasî ya moderin, li dora têgehên dewlet û desthilatdariyê hatiye şekildan. Ev kevneşopî ji Sumeriyan heta roja me ya îro bi pîrozkirina dewletê û avakirina pozîsyoneke hegemonîk a desthilatdariya navendî li ser jiyana civakî dest pê dike. Gelek ramanwerên klasîk, ji Eflatun bigire heta Hobbes, ji Rousseau bigire heta Weber, siyasetê bi piranî di çarçoveya teknîkên rêvebirinê û avakirina rêziknameyê û qanûnan de pênase kirine. Van tevahî desthilatdariyê an wekî amûrek meşrûiyetê ya pêwîst an jî wekî pêdiviyek ku ji xwezaya civakê derdikeve holê pênase kirine.

Realîzma Machiavelli, “hunera siyasetê” wekê komkirina desthilatdariyê ye pênase kirine û ev jî bûye sedem ku serdestan ango yên xwedî desthilat rêbazên neexlaqî rewa bihesibînin. Bi hezaran sal in ev bûye rêbazê esasî ya parastina desthilatdariyê. Bi demê re, van têgihîştinan adetek serdestiya siyasî çêkirine û bingeha teorîk ji bo krîzên pir-qatî yên îroyîn amade kirine.

Ramanên Rêber Abdullah Ocalan, ji vê xeta kevneşopî dûrketinek radîkal pêşkêş dike. Li gorî wî, siyaset ne xwesteka desthilatdariyê ye, lê şiyana rêxistinkirina jiyanê ye. Bi veqetandina desthilatdariyê ji rêveberiyê, ew îdîa dike ku rêveberî, bi beşdariya civakî gengaz e.

Di vê çarçovê de, siyaseta demokratîk ne xeyala civatek bêdewlet e, lê îhtîmala rêvebirina bê desthilatdarî ye. Rêber Apo dibêje ku desthilatdarî di bingeh de yekdestdar û nakok e û ji ber vê yekê meyla wê heye ku civakê bi berdewamî tepeser bike.

Desthilat ne tenê bi rêya şîdeta fîzîkî, lê di heman demê de bi rêya kontrola hestan, têkiliyan û hiş jî dixebite. Ji ber vê yekê, siyaseta demokratîk ne tenê modelek avahîsaziyê ye, lê di heman demê de pêvajoyek veguherîna exlaqî, estetîkî û psîkolojîk e jî.

Têgeha civaka exlaqî û polîtik ya li ser xwezaya civakî tê sazkirin, bingeha vê xeyala siyasî ya alternatîf e. Civak, bi xwezayî berjewendiyên kolektîf û jiyana hevpar dişopîne. Lêbelê, dewlet wekî mekanîzmayek tevdigere ku vê civakîbûnê parçe bike û şexs tenê bihêle.

Rêber Apo dibêje, dewlet di dîrokê de sazûmankirina serdestiya mêr e. Di vê çarçovê de, têkoşîna ji bo azadiya jinan ne tenê daxwazek ji bo wekheviyê ye, lê di heman demê de hêzek damezrîner di ji nû ve avakirina siyaseta demokratîk de ye jî. Civaka exlaqî-polîtîk, civak û înîsiyatîfên kolektîf dihewîne ku xwedî şiyana rêxistinkirina li derveyî amûrên desthilatdariyê ne. Kooperatîf, meclîsên gel, rêveberiyên herêmî xuyangên heyî yên vê formê ne.

Ev rêbaza rêveberiya alternatîf ne tenê di asta herêmî de, lê di heman demê de di çarçoveya rexneyên li ser pergala gerdûnî de jî girîng e. Siyaseta navendî ya dewletê sedema sereke ya mîlîtarîzm, wêrankirina ekolojîk, dûrketina civakî û homojenkirina çandî ye.



Ji aliyekî din ve, siyaseta demokratîk li ser pirrengî û herêmîbûnê ye. Ekolojî, azadiya jinan û beşdariya rasterast, bingehên vê modelê ne. Di vê çarçoveyê de, modela konfederalîzma demokratîk a ku ji hêla tevgera Kurd ve hatî pêşxistin wekî ezmûnek dij-sîstemê ye.

Lêbelê, navxweyîkirina vê modelê û kûrkirina wê bi beşên cûda yên civakê re hîn jî hewcedariyek girîng e. Her çend Kurd bûne hilgirên siyaseta demokratîk, ev rol divê di astên îdeolojîk, çandî û rêxistinî de bêtir were zêdekirin.

Mixabin di vê alî de em hê di serê rê de ne. Tecrûbeya ku li ser hîmên Şoreşa Rojava pêşketiyê û îro bi navê Rêveberîyê Xweser a Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi nav û deng bûye wekê bingeh û teorî rast be jî di pêkanînê de pirsgirêkên me gelek in. Pirsgirêkên şaredarî, rêveberîyê sazîyan, perwerde, çand, aborî, werziş, parastin û hwd di eslê xwe de çavkaniyê xwe ji vê pirsgirêkê zêhniyête digre.

Me bîna, sazî û tevger avakirine lê kesayeta azad ku di van sazîyan de pêşengtî bikin hê ava nekiriye. Sebebê esasî ya ve pirsgirêkê jî xwe di nav pêşengtî de nedîtin an berpirsiyariya vê hilnegirtin e. Ger kesayeta azad û demokratîk nebe, di sazî û dezgehên me de, di rêveberinê jîyanê de tiştê ku derkeve pêş pratîkên ku ji dewlet û desthilatdarîyê fêrbûyî be. Bêguman ji bo vê wext lazim e. Lê taybetmendiyekî esasî ya demokrasîya rasterast û beşdarî jî ewê ku divê em ji bo avakirina vê kesayetê hem ji xwe destpêbikin hem jî kes û rêveberên heyî sewqî guhartin û veguhartinê bikin.

Di encamê de, siyaseta demokratîk ne tenê alternatîfek ji bo rêveberiyê ye, lê di heman demê de şêwazek jiyanek exlaqî û stratejîk e ku dê civatek jiyanbar gengaz bike. Ev ne tenê bi dijî dewletê ve sînordar e; berevajî vê, ew têkoşînek ji bo parastina xwe û azadiya civakî ye li dijî zîhniyeta hêza serdest e.

Krîzên îroyîn; Desthilatdarî, hilweşîna ekolojîk, şer û xizaniya girseyî şêwazek nû ya siyasetê pêwîst dikin. Di vê çarçoveyê de, siyaseta demokratîk bangek e ji bo kesên ku wêrek in ku civakê ji nû ve ava bikin bi xilaskirina wê ji barên rabirdûyê.



## Pêwîstiya desthilata Şamê bi guhertina zihnî heye!

**Dilyar Cizîrî**

Di roja 1’ê hizêranê de şandeya Rêveberiya Xweser û nûnerên desthilata Şamê li paytext Şamê hatin cem hev. Hin mijarên girîng bi hev re nîqaş kirin. Daxuyaniyeke hevbeş hate weşandin. Ji bo tevahî gelê Sûriyê gaveke êrênî bû. Tişta cidiyeta wan danûstendinan nîşan dide jî roja li pey wê yek ser peymana Helebê ya berdana dîlgirtiyan ku hatibû taloqkirin, pêk hat. Bi sedan girtiyên di navbera aliyan de serbest hatin berdan. Gavên hatin avêtin ji bo piratîzekirina peymana 10’ê Adarê ku di navbera Fermandarê QSD’ê Mazlûm Ebdê û Serokê Dema Veguhêz a Desthilata Şamê Ehmed El-Şeri de ji bo baweriya di navbera aliyan de gelekî girîng bû. Lê hin tişt hene fikaran bi mirovan re ava dike. Şandeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê ji 7 kesan pêk dihat, di nav de 3 jin, nûnerê Suryaniyan, nûnerên kurd û ereban amade bûn. Bi wate di şeklê şandeyê de pirrengî û nûnertiya jinan zindî bû. Bê guman ev nerîn û asoyên Rêveberiya Xweser ên ji bo çareseriya aloziyan nîşan dide. Ev bi xwe jî peyamek ji tevahî cîhanê re bû.

Lê dema mirov li aliyê din dinere, nûnerên desthilata Şamê, 5 zilamên hemû yek xetê nîşan didin diyar bû. Di wir de nûnertiya jinan bi tu awayî tune bû. Di nerîna min de ev mejî û asoyên nerîna desthilata nû ya Şamê nîşan dide. Angu bi vê nûnertiyê dixwazin bêjin me danazana destûrî daniye, emê gavan jê paş de navêjin. Di heman demê de dixwazin bêjin Komara Sûriyê ya erebî wê li gorî nerîn û xwesteka me be. Ji xwe berê jî diruşmeyek wan ku dibêje “Ê rizgarkiriye wê biryarê bide”. Ew ji xwe bawer dikin ku wan bi hêza xwe Sûriyê rizgar kirine.

Ev rûniştin û peymanên niha têne imzekirin jî hêza QSD’ê û Rêveberiya Xweser nîşan dide. Lewma tu riyeke wan a cuda nîne ku pêk bînin, lê diyar e di mejiyê xwe de hîn jî naxwazin rastiyan qebûl bikin. Ev jî metirsîn û fikaran zêde dike. Hîn jî nikarin qenûl bikin ku Sûriyayê ya hemû gelê xwe ye. Heta niha li dijî pêkhateyên din bi taybet Elewî û Durzî her wekî din ku bi sedê salane li ser xaka Sûriyayê jiyan dikin, hemû cûreyên binpêkirinan pêk tînin. Rojane dîmen û nûçeyên kuştinê têne parvekirin.

Lê cardin jî em gavên ku têne avêtin bi erênî pênase dikin, lê heger desthilata HTŞ’ê di warê zihniyetê de nikaribe xwe bide guhertin, wê çarenûsa wan ji ya rêjîma berê ya Esed ne cûdatir be. Li ser xaka Sûriyayê bêyî hevdû qebûlkirinê ne pêkane çareseriyeke mayinde pêk were. Ji bo hevdûqebûlkirin pêk were pêwîstî bi hevdû efûkirinê û pêşxistina jiyana hevbeş heye. Li gorî diyar dibe, heta niha desthilata Şamê ne ketiye wê ferqê û li gorî hêzên heyî bi aliyan re didin û distînin. Desthilata HTŞ’ê û alîgirên wê dinirxandin û di nerînên xwe de desthilata Baas rexne dikin, lê di piratîka xwe de heta niha ne ji wan cûdatire. Di vê rewşê de ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê xwestin hîn hevgirtina xwe bi hêztir bike.



# ‘Çareserî, sîstema Hevserokatiyê ye’

**Endama Desteya Rêveber a Partiya Sûriya Pêşerojê Zelal Cîger diyar kir ku armanca wan ji lidarxistina konferansa Hevserokatî, avakirina civakeke demokratîk e û siberojeke azad.**

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Konferansa Hevserokatiyê bi dirûşmeya ‘‘Ji ciherengiyê hêza me tê, ji hevkariyê vîna me ava dibe’’ kombûna jinan a Zenûbiya lidarxistin. Ev konferans bi armanca pêşxistina sîstema hevserokatiyê li Bakur û Rojhilara Sûriyê û di heman demê de li tevahî Sûriyê ji bo pêşerojeke wekhev û azad e. Di konferansê de hevseroketiyên meclis û saziyên kantonên Reqa, Tebqa û Dêrazorê, endamên Meclisa Kombûna Jinan a Zenûbiya, Partiya Sûriya Pêşerojê, Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Desteya Jinan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn, Meclisa Jinan a Sûriyê, nûnerên Kongreya Îslama Demokratîk û Konfedraliya Civaka Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê amade bûn.

Derbarê konferansa Hevseroketiyê de endamê Desteya Pêşeroja Sûriyê Zelal Cîger ji Rojnameya me re axivî.

**‘Armanca me redkirina desthilatdariyê ye û pêşxistina hevserokatiyê ye’**

Zelal Cîger destnîşan kir ku armanca me rakirina sîstema desthilatdariyê ye û pêşxistina sîstema hevserokatiyê ye û wiha got: “Ev konferansa Hevserokatiyê armaca me jê sîstema ku ji 2014’ an ve hatiye meşandin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, destpêkê li herêm û kontona Cizîrê, Kobanê û Efrînê sîstema hevserokatiyê hate meşandin. Dema ku Rêveberiya Xweser di 2014’ an de hate avakirin di wê demê me sîstema Hevserokatiyê di hemû sazî Û dezgehên xwe de esas girt û bi pêşxist, ji bo me gelek girîng bû ku ev sîstem bi pêşkeve, ji ber ku armancek me hebû ku di dîroka me de û bi taybet di Rojhilata Navîn de sîstema desthilatdarî û koletiyê dihat meşandin, newekhevî û qirkirin gelek li pêş bû, ji bo em vê sîstemê bugherin û tune bikin, me wekheviya gelan û bi taybet wekheviya herdu zayendan da pêş ji bo herdu zayend bi hevre civakê bi rê ve bibin, ev sîstem bi felsefeya Rêber Apo derket pêş ku di sîstema neteweya demokratîk de û di sîstema Rêveberiya xweser de hat avakirin, ji ber ku wekheviya di navbera jin û mêr de heye. Armanca me sîstema desthilatdariyê û koletiyê ya ku ji 5 hezer sale tê meşandin ji holê rakin û li şûna wê sîstema wekhevî û hevserokatiyê li pêşxin ku jin jî rola xwe têde bilîze, dema ku em van konferansan ji gelê xwe re lidardixin ji bo em ji wan re diyar bikin ku modêleke sereke ya civaka demokratîk derkeve pêş.”



**‘Sîstema hevserokatiyê sîstema wekheviyê ye’**

Zelal diyar kir ku sîstema hevserokatiyê sîstema wekheviyê ye û wiha domand: “ Di vê konfernasê de rêveberî, sazî û dezgehên civakî, desteyên jin, rêveberiya xweser ya Tebqa, Reqa û Dêrezorê amade bûn, hemû beşdarên jin û mêr kar û xebatên xwe yên van salên dawî û bi taybet piştî rizgarkirina van herêman ji DAIŞ’ê nirxandin ku çawa guhertina zihnî di milê jin de çêbûye. Êdî jin serdestiya zilam li ser xwe qebûl nake. Mêrên oldar û şêxên Eşîran ji di konferansê de amade bûn û nêrîna xwe jî dan ku hevserokatî û wekhevî modêleke girînge ku were pêşxistin ji ber ku hewcedariya me pê heye, lê mixabin ji ber zihnîyeta paşverû ya dasthilatdariya mêr û dewletê ku mafê jinê xwaribû, koletî û serdestî li ser jinê feriz dikir, êdî divê em bighêjin wê astê ku em wekhevî û demokratiyê bidin pêş û li ser wê esasê bimeşin.”

**‘Sîstema hevserokatiyê nimûneya sereke ya sîstema rêveberiyê ye’**

Endamê Desteya partiya Sûriya pêşerojê Zelal Cîger di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Sîstema hevserokatiyê nimûneya sereke ya sîstema rêveberiyê ye, Rêber Apo ferdiyeta di civakê de qebûl nedikir û di felsefeya xwe de dibêje ‘‘kesek ji bo civakê û civak ji bo kesekî’’ divê li ser vî bingehî bixebitin. Di vê felsefeyê de pêwîste civak bemeşe û li ser vî esasê kar û xebat bikin, ji bo pêşerojek demokratîk û azad ji bo civakê dibe ku em li ser esasê hevserokatî, wekheviya zayendan û felsefeya Rêber Apo ya azadiya jinê bimeşin. Divê mirov sîstema demokratîk, wekhev û jiyana azad ji malbatê destpê bikin, ji ber ku malbet nimûneya biçûk a sîstema demokrasiyê ye. Bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo me sîstema demokratîk û hevserokatî naskir ji bo pêşerojek azad ji civakê re.”

## Sûriyê êdî di bin çavdêriya DYA û Îsraîlê de ye…



**Zekî Bedran**

Sûriyê berû kû ve diçe, pêşeroja xwe li kuderê dibîne, pirsên wiha girîngî dibînin. Piştî hilweşandina rejîma Baas’ê yê ku hat û li Şamê rûnişt HTŞ’ê bû. HTŞ’ê ji bilî xwe hemû partî, pêkhateyên siyasî û avahiyên rêxistinkirî ji derve hişt. Wî bi xwe hikûmet ava kir. Wan got ku ew ê kongreyek neteweyî lidarbixin û ev yek bêyî ku kesî tevlî bike kir. HTŞ bi xwe destûra demikî amade kir û bêyî beşdariya yên din hikûmeta demkî ava kir. Bi kurtasî, ew ber bi avahiyek navendî û tûndirew ve çû ku li ser ol û nijadperestiya erebî hatibû damezrandin, demokrasiyê ji holê radikir û ne kêmî hişmendiya rejîma Baasê bû. Hemû beşên civakê yên ku li dijî Baas’ê şer dikirin û dixwestin pergalekî demokratîk were avakirin, hatin dûrxistin. Wan jê re digotin şoreş, lê wan her tişt kir da ku rê li ber pêşketina hawîrdor û bingehekê şoreşgerî bigirin. HTŞ’ê daxuyaniyek da û gotin ku şoreş bi dawî bûye û dem dema damezrandina dewletekê ye. Derdorên hestiyar piştî van pêşketinan hişyarî dan ku şoreşa Sûriyê tê dizîn. Bi rastî, HTŞ hêviyên gelê Sûriyeyê ji bo têkbirina Baasê û avakirina hikûmetek şoreşger û sîstemek demokratîk bê hêvî kiriye. Ew wisa tevdigeriyan ku ji bilî wan kesî têkoşîn nekiriye, ked nedabe, an jî bedel neda ye.

Lê, Rêveberiyeke Xweser hebû ku li rêjeya sisê û yekan ve erdnîgariya Sûriyê hikûmeteke demokratîk ava kiribû. Her wiha berxwedan ji aliyê Dûrzî û pêkhateyên din ve jî hebû. Hemû gelê Sûriyê ji vê şerê navxweyî bandor bû û bedelên giran da. Lê HTŞ wisa tevdigeriya wekî ku keda yek ji van tinebû. Ji her kesî xwest ku wê yekê bi pejirînin. Ew kesên ku nepejirandin bi temamî dihatin dûrxistin. Di vî warî de, ew ji ber avakirina rejîmeke navendî û tûndrew ku ji Baasê wêdetir diçû, hatin rexnekirin. Lê, HTŞ’ê tiştê ku dizanî jî wisa domand. DYA û Ewropayê jî ji rewşa heyî bi fikarbûn. Welatên Ereb jî di heman rewşê de bûn. Ew bi baldarî nêzî HTŞ dibûn. Ji ber vê yekê wan ambargo ranekir. Wan HTŞ ji lîsteya rêxistinên terorîst dernexist. Lê, ew li Şamê rêveberiyeke din nedîtin ku pê re danûsitandin bikin. Wisa xuya bû ku alternatîfek din tine bû. Di vî warî de, wan hewl dan ku li ser HTŞ’ê bixebitin û wê bigihînin xalekê. Ji ber vê yekê hemû dewletan bi HTŞ’ê re peywendî û goftugo pêşxistin. DYA hîn tevahî siyaseta xwe ya li ser Sûriyê zelal nekiriye. Ya rasttir, wan amadekarî an danûstandinên xwe ji raya giştî re nîşan nedan. Helwesta Îsraîlê eşkere bû. Wê HTŞ’ê wek çeteyeke terorîst dihesiband û xalbendên girîng yên HTŞ’ê bombebaran kir. Ew hêzên xwe yên leşkerî dişîne Sûriyê. Israîlê got ku ew ê ji bo xwe herêmeke ewle ava bike û serweriya xwe mayinde bike li axa Sûriyê. DYA ji bo misogerkirina ewlehiya Îsraîlê, pêşketinên dawî yên li Rojhilata Navîn didomand. Lê Tirkiyeyê bi tevahî piştgirî da HTŞ’ê û wê li derveyî welêt bazar dikir. Wan hewlên xwe ji bo avakirina artêşekê û xurtkirina serweriya xwe li Sûriyê berdewam kir. Di vê mijarê de bi Îsraîlê re rû bi rû man. Bi taybetî Tirkiyeyê dixwest ku Kurd û Rêveberiya Xweser têk biçe. Ji aliyekî ve bi xwe û çeteyên di bin fermandariya wî de êrîş dikir, ji aliyê din ve jî dixwest HTŞ’ê jî di nav wan êrîşan de hevkariyê ji wan re bik e. Di heman demê de, ew bi DYA re danûstandin dikir da ku QSD’ê ji holê rabike. Bi taybetî hatina Trump ser desthilatiyê hêviyek zêdetir da Erdogan. Wî difikirî ku ew ê bi wî re bigihîje rêkeftinekê û di mijara Kurdan de piştgriyê bigre.

Geşedanên derbarê Sûriyê de bi serdana Trump ya ji bo Erebistana Siûdî ji nişka ve leztir bûn. Gavên ku ti kes li bendê nebû hatin avêtin. Trump bi Ehmed Şera re civiya û got ku ew ê ambargoya li ser Sûriyê rake. Piştî demekê, welatên Ewropî ragihandin ku ew ê ambargoyê rakin. Wezîrê Derve yê DYA di daxuyaniya xwe ya li Desteya Peywendîyên Derve ya Senatoyê de got, “Heke em piştgirîya HTŞ’ê nekin, ew ê demek dirêj li ser lingan nemîne û terorîzim li herêmê hîn bêtir zêde bibe.” Wezîr hewl da ku Kongresê razî bike ku ambargoyê rake. Ev hemû pêşketin nîşan didin ku Ahmet Şara soz da ku ew ê li dijî Trump û hêzên Ewropî dernekeve û dê li gorî wan tevbigere. Hêzên rojavayî naxwazin Îran û Rûsya dîsa li Sûriyê bandor bibin. Sûriye dê li gorî Peymana Îbrahîmî ya di navbera Ereb û Îsraîlê de hatiye îmzekirin tevbigere. Nûnerê taybet ê Trump ji bona Sûriyê jî ji çapemeniyê re ragihand, “Sûriye dikare di nav Peymanên Îbrahîmî de cih bigire.” Rêveberiya HTŞ’ê pejirand ku ew ê li gorî xetên ku ji hêla DYA ve di avahiya nû ya Rojhilata Navîn de li ser bingeha ewlehiya Îsraîlê hatine xêzkirin, tevbigere. Bi gotineke din, siyaseta Sûriyê êdî dê li ser DYA û Îsraîlê re bê meşandin.

Tirkiye di demên dawiyê de ji bo ku bi DYA re li hev bike û hêzên QSD’ê ji holê rake, gelek hewildanan dik e. Wisa xuya dike ku li ser vê mijarê lihevhatinek hey e. Tirkiye, DYA û Sûriyê di navbera xwe de komekê xebatê ya sêalî dane avakirin. Wisa xuya dike ku wan li hev kirine ku şerê li dijî DAIŞ’ê û girtîgehên ku çeteyên DAIŞ’ê tê de tê girtin, radestî rêveberiya Şamê bikin. Ew ji DYA re dibêjin ku êdî pêwîstî bi QSD’ê tine ye, ne hewce ye ku peywendiyan bi wan re bidomînin. Tiştên ku Tirkiye dibêje êdî propaganda nînin. Ev yek bandorên xwe li ser gêşedanên qadê jî dike. Nûnerê taybet yê Trump dest bi zextê li ser rayedarên QSD’ê dike da ku entegrasyona nav artêşê bileztir bikin û gavan bavêjin. Tê gotin, “Peymana Şamê bi cîh bînin û tevlî hêzên dewletê bibin.” Lê Kurd û herêmên xweser ewlehiya wan tine ye. Tu zagonekî tine ye ku van mafan nas bike. Di vî warî de pêşketin leztir bûn û şêwazekê sosret girtin. Bi rastî, tiştê ku qewimî ne zêde balkêş in. Ti pirsgirêkên DYA bi demokratîkbûna Sûriyê re tine ye. Ew balê dikişînin ser berjewendiyên xwe. Di vî warî de, pêwîst e gelê Sûriyê û hêzên demokratîk hîn hişyartir bin.

## Pirsên civaka Kurd



**Farûk Sakik**

Dewleta kûr an jî ya esas, dest guhert. Berê dewleta kûr a Tirkiyê artêş bû. Darbe dikirin û polîtîkayên dewletê wan dest nîşan dikir. AKP’ê dema ku bû desthilat bi cemaetêre ev hêz xist bindestê xwe. Hêdî hêdî di nav artêşê de bi rêxistin bû. Piştî demek jî ‘dewleta kûr’ (Ergenekon) şand zîndana Silivrî. Dema ku di sala 2015’an de Kurdan desthilata AKP’ê xist bin xeteriyê, dît bi serê xwe nikare bibe desthilat, xwe spart wan hêzên avêtibû zîndanê. Ji zîdana Silivrî ew derxist û li dijî Kurdan şer da destpêkirin. Berdevkê van hêzan Devlet Bahçelî bû. Dewlet, bi giranî êdî di dest Bahçelî de bû. Hemû saziyên dewletê yên stratejîk (Emniyet, mustejarî, midûriyetên giştî yên wezeretan-wezaret ên AKP’ê bûn li midûriyetên giştî di dest MHP’ê de bûn- qismek jî artêşê, di dest dewleta kûr de ye. Êdî ev hêz siyaseta Tirkiyê destnîşan dikin.

Em vegerin ka ev pêvajo çawa dest pê kir?

Rojek li ofîsa Bahçelî li qata 4’an kom bûn û biryarek bi vî rengî hat girtin. Na. ji vê navendê zanyar, akademisyen, hiqûqnas, di siyasetê de kesên xwedî tecrûbe bi çûyîn û hatina Îmraliyê de biryarek wiha girtin. Rêber Apo ew îqna kirin. Bi vê pêvajoya nû wê hemû kodên demokrasiya Tirkiyê bihatina guhertin. Bi wan da bawerkirin ku heger piştî Lozanê li dijî Kurdan û gelên wê axê dirustbûna, îroj wê aramiya Tirkiyê di asta herî jor de bûya.

Lê wê serdemê hêzên navdewletî ew xapandin. Di destpêkê de li dijî komunîzmê û piştî demekê jî ew li dijî Kurdan sor kirin. Di destpêka sala 2024’an de êdî Kurd jî bûbûn xwedî statuyek. Bi polîtîkayên qirkirinê yên li dijî Kurdan encam nedigirtin. Êdî ew dewletên ji dervejî nikaribûn dewleta Tirkiyê li hember Kurdan sor bikin.

Ji ber van sedeman ew kes li ser Ofîsa Bahçelî ji qata 4’an birêketibûn.

Dema ku ev kesayet derbasî Îmrali dibûn Erdogan li ku derê bû?. Bê çareyî lê temaşe dikir. Dixwest pêşî li wan bigire. Lê êdî hêza wî jî nemabû. Ew hêz-desthilatdarî di 31’ê Adara 2024’an de jê girtibûn. Erdogan ji neçarî erê kir. Erê kir lê îroj dixwaze giran tevbigere, bihêle demê. Hêvî dike ku bi demê re dive ku li cîhanê an jî li Tirkiyê bayek ber bi wî were. Dive ku hin alî midaxle bikin û vê pêvajoyê bidin seknandin. Hêviyên wî ev in. Ji ber wê jî gavên ku wê werin avêtin, bendewariyên Kurdan pêk nayne. Ev pakêta darazê ya 10’emîn jî bi vê çarçoveyê de ji meclisê derbas dike. Bersiva; pirsa di pakêtê de niyeta pêvajoya nû çima tune, li benda payizê bimînin, didin. Erdogan dixwaze, li hember vê helwesta wan, aliyê Kurdan dawî li pêvajoyê bînin.

Di nav civaka Kurdan de gelek pirsên wek; “gelo!, çima?, ka gav nehatin avêtin, me dixapînin, heta kengê? Em çima bi Erdogan bawerî bînin? (bawer in ku Erdogan ev pêvajo daye destpêkirin), Cemîl Bayik wê here ku derê? Gerîla wê di siyaseta demokratîk de çawa cîh bigire? Ev çîroka çek teslîm kirin çi ye? Bahçeliyê dijminê Kurdan serê xwe li kîjan dîwar-hesinî da ku ev pêvajo da destpê kirin? û hwd…

Divê tevgera azadiyê, rewşenbîrên Kurd, ragihandin, siyasetmedar, herkesên di vê mijarê de xwe berpirsyar bibînin û bersiv bidin van pirsên civakê. Civak bersivên şaş û nerast ji ragihandina alîgirê Erdogan digire. Piştî demekê jî mêjûyê wan şêlû-tevlîhev dibe. Ew civaka xwe dixapînin, lê divê em civaka xwe bê agahî nehêlin. Bersiv bidin pirsên wan. Di xeyalên wan de hên jî Kurdistanek azad heye. Em li van xeyalên wan ê pîroz xwedî derkevin.